



Danerê Rojnameya pêşî ya
Kurdî Miqdad Mithed Bedirxan

Hejmar, No: 155
Çileya Pêşin
December 1994
Buha - Price
20 SKR, 4 DM

Rojnameya Mehane

Ma heta kengî Kak û Mam??!!...

Dîsa şerê xwekujiyê

Şûna ku her du hêz bi riya parlamentooyê û hukûmetê çareyan ji êş û janên gel re peyda bikin, şûna ku bi cihanê bidin xuya kirin ku Kurd dikarin îdareya xwe bikin, şûna ku dilên Kurdan şa bikin, dijminan rûrêş bikin; bi çekêن giran qira hev tînin, gel, netewe, dezgehênetewi ji bîr kirin, dixwazin bajarêñ Kurdistanê li hev "par" bikin.


Li gor nûçeyen ku ji Kurdistanâ Başûr têñ, dîsa şerê xwekujiyê di navbera Partiya Demokrat a Kurdistanê-Yekîtiyê (Partî) û Yekîtiya Nişîmanî Kurdistanê (Yekîti) de dest pê kiriye. Şer di nîvê meha 12'an de li Hewlîrê di navbera herdû hêzên gewre de qewimîye û herdu hêzan gelek zahiyat dane hev. Li gor nûçeyen 400 kes hâtine kuştin û gelek kes ji birîndar bûne. Li gor berdevkê Yekîtiyê yê Swêdê Sirwan Semin Hewlîr ji Partiyê hatiye paqîjkirin û ketiye bin kontrola wan, lê li gor berdevkê Partiyê yê Swêdê Taha Berwari ji Hewlîr bûye du beş. Lê li gor çavkaniyan Yekîti dest daniye ser buroyê rojnameyê Partiyê "Birayeti" û "Xebat" û radyoya Partiyê.

Yekîti riyen ku dicin Hewlîrê

girtine. Hevalîn Partiyê ji Se-lehedînê nikarin herin Hewlîrê. Yekîti tenê bi vê jî nemaye Serokê Meclîsê û endamê Polit-Buroya PDK'ê Cewher Namik Salim ji re-hin girtine û li ser ultîmatona Partiyê serbest berdane.

Li gor nûçeyen dawî ku ji herêmê têñ, Hewlîr teslimê INC'ê bûye. Ev şerê malwêranî ku di navbera herdû hêzên ku bi salan in raqîbên hev bûne rûdaye ji rewşa wanê paşdemayî, mîjîyê wanê eşîrtiyê, nekamilbûna şuûra milî û bê-tahmûlya wan tê.

Herdu alî ji bi idayêñ cuda hev iþham dîkin; yek sebebê şer dixe stuyê yê din. Herdu alî ji dibêjin ez "bi heq im". Lê di vî şerî de terefîn bi heq tunene. Ji ber ku ev şer ji ortêrakirina mewziyên bidestxitîne ku wan xeyal ji bikirana nikaribûn



Parlementoya Kurdan di bin postalên Kurdan de
bê alfîkariya dewletên Xerbê wan bi dest bixistana û bigîhaştina vê qonaxa pîroz. Li ser sebebê şer, Yekîti Partiyê, Partî ji Yekîtiyê

iþham dike. Li gor iðdiyêñ Yekîtiyê, hatinêñ ku ji gumruka Brahim Xelil têñ Partî wan transferê Dewleta Federe nake. Ya duyem

Partî li dijî aşireta Herkî şiddetê bi kar tîne û ev jî nahê hesabê Ye-

Dûmahîk: r.11

**Sala nû ya 1995'an bila ji bo gelê Kurd bibe saleke aştiyê, ronabiyê û serkeftinê!
Bi vê hêviyê em sala nû ya xwendevanêñ Armancê pîroz dîkin Redaksiyon**

Demokrasiya Tirkîyê li ciyê ku pirsa Kurdi dest pê dike, diqedê

Bêşik li Ewrûpayê di navbûyerên bûyî de yek ji surprîzen mezîn yê salê li Tirkîyê cezagirtina parlamenteñ DEP'ê bû. Ewrûpa dipa ku Tirkîyê ji bo Yekîtiya Ewrûpa dûr nekeve, bi biryareke "xelet" Ewrûpiya ji

xwe aciz neke, hevdûdîtinêñ yekîtiya gumrukê ku di nav welañen Yekîtiya Ewrûpa û Tirkîyê de dom dîkin û 19'ê Çileya Pêşin di civîna bîryardayînê de encameke baştîr bi dest bixe wê parlamenteñ DEP'ê ceza neke.


Lê Tirkîyê ya xwe kir, ceza da her 8 parlamenteñ Kurdi ku li dor 5 meha girtî ne û dihatin mehkeme kirin. Wek tê zanîn Leyla Zana, Hatip Dicle, Ahmet Turk, Orhan Dogan û Selim Sadak her yekê 15 sal, Sedat Yurttaş

7 sal û nîv, Mahmut Alinak û Sirri Sakik 3 sal, 7 meh ceza xwarin. Ji bona ku Remzi Kartal, Mahmut Kılıç, Ali Yiğit, Nizamettin Toguç, Naîf Gunes û Zübeyîr Aydar li derveyî welat bûn, ji cezayêñ DGM'a Nusret Demîral xelas bûn.

Ji bo cezakirina parlamenteñ DEP'ê, helbet sedemîn Tirkîyeyê hene. Tirkîyê di politika xwe ya 70 salan de, daye xuya-kirin ku dikare dest ji hemû avantaj û berje-wendiyê xwe berde,

lê nehêle pirsa Kurdi çareser bibe û Kurdistanê di destê xwe de bigre. Dewleta Tirkîyê de cezakirina parlamenteñ Kurdan de da xuyakirin ku di vê politika xwe de çiqas qerardar e, hevdû-dîtinêñ yekîtiya gumrukê bi Ye-kîtiya Ewrûpa re jî di vê pirsê de ji bo wan ne bend e.

Bûyerek bi vî rengî, nûneren gel ku ji aliye gel ve hatibin hilbijartîn û ji bo dîtinêñ wan cuda ne û ne wek dîtinêñ resmî yên dewletê ne û bi emrê memurên dewletê bêñ eziłkirin li tu demokrasiyê Ewrûpayê nehatiye dîtin. Bûyerek bi vî rengî dikare bes li demokrasiyê wek Sadam û yên Latîn Amerikayê bêñ dîtin. Di gel sicîleke weha, Tirkîyê hîn ji bê şerm qala demokrasiya xwe dike, bi îmza avêtina peymanê navnetawî û hin pakîtên bi nav xweş, dewletê Ewrûpayê egle dike, dixapîne. Demokrasiya Tirkîyê li ciyê pirsa Kurdi dest pê dike, diqedê.



DGM ya Anqerê cezayêñ giran da n Parlamenteñ DEP'ê. (Ji milê rastê ber bi çepê L. Zana, Orhan Dogan, Hatip Dicle, Mahmüt Alinak, Selim Sadak û Sirri Sakik)

Nameyeka eskere

Ji bo serokên hêja;
Kak Mesûd BARZANI û Mam Celal TALABANI

Serokên hêja yên miletê Kurd!

Li ser goşeyekî vê axa Kurdistanê ya perçê û wêrankirî; ya ku zordarî, mafxurî, êş û elem tu caran ji ser nehañ birrîn, ev çend sal bûn ku pencereyek vebûbû ku tê ra ba û ronahiya azadiyê dihat, di-gihişte beşekî ji miletê Kurd. Bi vebûna vê pencerê û hatina ba û ronahiya azadiyê ne ku tenê zordarî û mafxurî ji ser vî besê miletê me rabûbû her wiha, taqekeka mezin a taze dida miletê me yê perçen nav şeveresê û hêviyaka xurt li nav vê şeveresê pêdixist ku bê dîtina dûmâhîka şevresê êdî ne dûr e, di demeke nêzîk de wê karibe ba û ronahiya azadiyê li se-ranserî welatê me yê çareres belav bibe.

Belê, Serokên hêja yên miletê Kurd!

Em bahsa Kurdistana Başûr di-kin ku berî çend salan, bi buhay ekî gelek giran, li serê ilana dew-leterka federe hat kirin, parlamente-yek hat hilbijartîn û hukûmetek hat damezirandin. Cara pêşin bû, pişî şerekî 200 salan yê ji bo te-haqûqkirina mafê idarekirina xwe bi destê xwe firsetek li ber miletê Kurd peyda bû. Ma ne welê bû. Vî serê zordar ê wêranker berî dused salan bi êrişa Sultanê Os-

manî ser bi dezgehêne me yên xwe idarekirin; yanî mîritiyêne me dest pê nebûbû û ji wê rojê heta iro, gava mîritiyêne me hebûn bi ser-atiya wan, gava ew rabûn bi ser-atiya

şêx, seyid, pîr û reisên eşrîn xwe, gava ew ji holê rabûn, bi seroka-tiya ronak-bîr, malme-zin û xîret-şinasen xwe û di dema iro de jî bi sero-atiya parti

û rîxistinêne xwe yên milî, me her û her şerî wê yekê kir ku, idareya biyaniyan, zilm û zordariya wan ji ser welatê me rabe û em karibin bi destê xwe xwe idare bikin.

Berî çend salan, ne li hemî Kur-distanê lê li başûrê vî welatê bex-treş li ser erdekî piçûk ev imkan, imkana ku miletê Kurd qedera xwe bi destê xwe tayîn bike, pêkhat. Lî ev saleke ku miletê Kurd û hemû dilxwaz û dostê vî mileti-keitine nav tirsekî mezin ku ev fir-sata dîrokî ji wê ji destê miletê Kurd derkeve, wê pencereyka ku ba

û ronahiya azadiyê tê ra dihat wê bê girtin. Li vî perçeyê welêt wê careka din zilm û zordarîkêsan bibe jiyane ka rojane.

Sedemê vê felaketa mezin jî hûn

Ji bo ci mileti u hela hela ji bo milete Kurd ê ku di rewseke gelek hessas de ye, ne siyaset û reqabeta navbera partiyan bi vi awayi dibe, ne hukumkirin ne muxalefet û ne ji parvekirina nimet û dewlemendî an hebûna welatî bi vi awayi bi rîyeke weha bi ser dikeve. Hûn intixar dîkin û miletê Kurd jî bi xwe re dibin hilakê. Hûn jî dizanin ku we ev maf nîne. Hûn jî dizanin ku wê tarîx behsa we bike, lê divê ne bi vi awayi be.

bi xwe ne, herdû rîxistinêne we ne ku ev e saleke, bi bahanêne pûc û vala, geh li ser bahana erseyekê, geh li ser serokê eşîra Herkiyan, geh li ser gumrukâ Birahîm Xelîl û geh li ser tîşîd vala yên din hûn miletê Kurd berra hev didin, hûn şerî yekûdin dîkin yan jî hûn sitû li ber şerxwazan û suikastsaz û komplosazên dîjin xwar dîkin. Belki bahane-yê we yên şer derxistin li ber çavêne we ciddî bin, gi-ring bin; lê gava meriv mafê milete-kî û qedera miletekî xist kefa teraziye ya din ew bahanêne we we-

kî hevdeyeka pembo sivik dimîne, bêqîmet dibe.

Serokên hêja!

Ma we ci zû ji bîkir ku berî se salan ji ber hovitiya rejîma Sed-dam, di zivistaneka bi ba û berf û bager de sê milyon Kurd bi kal û pîr û pîçûkên xwe, bi jîn û mîrên xwe bi serê çiyan ketin, hatin li ser hidûdên Tirkîyê û Îranê asê bûn, xelkê di hawa re nan ji wan re davetin, ew jî li pey wan nan û xureka nava çamûrê dipekiyan da zarokên wan ji birçînâ nemirin. Tevî wê jî birçîbûnê, serma, qî-rej û bêxwedîtiyê gîhaşt nuxteyek welê ku rojê du hezar kes mirin.

Ma ci zû we 180 hezar kesen ku di ENFALê de, 5 hezar He-lepçeyiyê ku li ber çekên kim-yayî di nav du seitan de, 8 hezar Barzaniyê di Sahra û zîndanên Ereban de mirin ji bîr kirin. Ma ci zû we bi deh hezaran Feyliyên sirgûnkirî û malwîrân û talankirî jîbir kirin. Ma ci zû we Mûsil û Kerkûka bin destê dîjin jîbir kir. Ma we kengî ji bîr kir ku berî çend salan ji bo ku hûn pêşmergeyên fedekar ên vî mileti li cihêkî bicîh bibin, biçin nav welêt û derkevin, têkoşîna xwe bidomînin we çend hustu li ber mulazimîn istîxbarata İمام Xu-meynî, Hafiz Esad û Turgut Ozal

efendi xwar kir. Ci zû we hemî tarixa Kurdistanê ji bîr kir.

Ji dehan yekê wê tahamula ku we li ber zabîten muxaberata dij-min nîşan dida nîşanî hevîdu bi-din, hûnê bibînin ku, hemî meselîn we wê bê şer çareser bi-bin.

Ma heta nuha we daxwaza wê yekê nedikir ku miletê Kurd qede-ra xwe bi destê xwe tayîn bike. Ji vê yekê mexseda we çiye? Aya mexseda ew e ku qedera miletê Kurd her mirin û wêrân bûne, ne ku biyanî hûn bi xwe vî mileti bikujin û wêrân bikin?

Bese êdi gelî serokên hêja!

Me hezar hezar hêvî û rîca ji we hene ku bes e idî. Rêkê li ber vê intixara tarajîk (lê li ber çavê dînyayê komîk) bigirin idî. Çu behane neşen mahneyeka maqûl bidin vê intixarê. Ji bo ci mileti û hela hela ji bo miletê Kurd ê ku di rewseke gelek hessas de ye, ne siyaset û reqabeta navbera partiyan bi vi awayi dibe, ne hukumkirin ne muxalefet û ne ji parvekirina nimet û dewlemendî an hebûna welatî bi vi awayi bi rîyeke weha bi ser dikeve. Hûn intixar dîkin û miletê Kurd jî bi xwe re dibin hilakê. Hûn jî dizanin ku we ev maf nîne. Hûn jî dizanin ku wê tarîx behsa we bike, lê divê ne bi vi awayi be.

Geli serokên hêja

Hemû Kurdan, bi dilekî tijî tîrs lê bi hêviyaka mezin, beren xwe dane we.

Hêviyâ vî mileti pûc mekin!

Komeleya Mafê Mirovayî a Diyarbekirê hat girtin

Di 29'ê Çileya Pêşin de Walîyê Diyarbekirê Komeleya Mafê Mirovî a Diyarbekirê girt. Serokê Komelê Halit Temlî û endamên Komîteya Kargir yên Komelê Melike Alp, Hayrî Veznedaroglu û Huseyin Yildiz avêtin hefsê û derheqê wan de dawa hat vekirin.

Li gor Walî sebebê girtina Komeleyê ew e ku, komele bi navê "Rapora Rewşa Herêma Fewqalade a 92'an" kitêbek çap kiriye û di kitêbe de propagandaya cûdaxwazî ha-tiye kirin.

Ji ber çapkiranî kitêbe ber-pirsîyaren Komeleyê Av. Mahmûd Şakar, Av. Nimetel-

luh Gunduz û Av. Abdullah Çeger berê hatibûn girtin.

Dewlet bi her hawî li Kur-distanê şerekî dijwar dike. Kur-dîn sîvîl dikuje, gundan vala dike, xelkê mecbûrî bar-kirin dike. Rojname û kova-rên Kurdan wexta kirinê dewletê tînin zîmîn tîn qede-xe kirin, di derheqê ber-pirs û nivîskarên wan de dawe tîn vekirin û wan da-vên hefsê.

Komeleya Mafê Mirovî a Diyarbekirê ji ber ku ihlalên dewletê li Kurdistanê eskere dike û kîrinê wê derdixîne ber çavan hat girtin û berpir-sen wê avêtin hefsê.

Mihemed Bekir wefat kir



Welatparêzê hêja Mihemed Bekir di 29'ê Çileya Pêşin de li Stokholmê ji ber nexweşîya dil wefat kir.

Mihemed Bekir di 1942'an de li Kurdistana Sûriyê li gundê Çeqelî ji dayik bû.

Di sala 1948'an de bû endamê Partiya Demokrat a Kurden Sûriyê. Di sala 1961'an de hat girtin û işkence di.

Di sala 1963'an de Partîji bo xwendinê ew şand Çekoslovakîyê. Di sala 1973'an de Muhendisiya elektîrkê xelas kir.

Di sala 1978'an de li Swêdê bi cih bûbû.

Canazê wî bo Kurdistana Sûri hat şandin.

Mihemed Bekir 9 hejmarên kovara Hawarê ji tîpên Erebî wergerandibû tîpên Kurmancî û çap kiribû.

.Em redaksiyona Armancê ji malbata wî re sersaxiyê dixawazin. Bila serê gelê Kurd sax-be.

PDK-Bakur Kongreya duyem civand: "Bila ser raweste"

Kongreya Duyem ya PDK-Bakur di meha Çileya Pêşin de ci-viya. Meclisa Partiyê ya PDK-Bakur encam û bîryarên kongreyê bi beyanekê gîhand raya gişî.

Hevgirtin-PDK navê xwe gu-herand kir Partiya Demokrat a Kurdistan-Bakur (PDK-Bakur). PDK Bakur çend guhertinê pro-gramatîk ji kirin. Li gor guherti-nen nuh, di programa partiyê de, armancên politîk yên sereke bi se-xalan hatiye tespitkirin!"

"- Pêkanîna mercen qedera xwe bi destê xwe tayîkirin,

- Di Cumhuriyeta Tirkîyê de li gor huquqa navnetewi ew mafen siyasi, kulturî, cîvaki û aborî ji bo Kurdan bîn bi dest xistin.

- Li perçê Kurdistana ku di

Kongreya 3'emîn a Yekîtiya Jinêne Kurdistanê li Swêdê di 25'ê Çileya Paşin de li Stokholmê çêbû. Nêzî 30 nûnêr beşdarî kongreyê bûn.

Kongre dûr û dirêj li ser kar û barê xebata xwe sekîn û 10 saliya xebat û têkoşîna jînê Kurd li Swêdê pîroz kir.

Yek ji bîryarên Kongreyê ew bû ku

kovara "Jîn" êdî dê bi Swêdî, Kur-mancî û Soranî weşana xwe bi-domîne.

Komîteya nuh ji van kesan pêk tê: Bonye Cigerxwîn, Şukran Baksî, Seyran Duran, Rûken Misto, Zînnet Bal, Mesûde Kaya, Medya Hesen, Lorîn Nasberg û Tara Tiwana

Kongreya 3'emîn a Yekîtiya Jinêne Kurdistanê li Swêdê

Armanc

Rojnama Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgin, Mîrza Bextiyar, Lewend Fîrat, S. Rêving, M. Lewendi, Redaktör berpirsyar: M. Elî, Berpirsiyare besê Dimilki: Malmîsanî, Berpirsiyare rûpelîn edebî: Ehmed Huseynî

Utges av: Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen

Abonetî/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450 SKR, Li Ewrûpa: 60 DM.

Li derveyî Ewrûpa: 50 \$.

Anons/İlan: nîv rûpel/en halvsidan 2500 SKR

Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 4972255-6 Adres: Box: 152 16, 161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

1994: Xwekuji, teror, koç...

Sala 1994'an ji bo gelê Kurd saleke xerab bû. Di gelek qad û waran de pêşketin çênebû, lê di gelek waran de gelê Kurd çeper û prestij wenda kir.

Li Kurdistana Başûr serê xwekujiye tevî ev şerî dawî sê cara rû da. Şer ji her du carê berê gurtir dom dike, nuha gund û bajaran ji hev "rizgar" dikan.

Li Kurdistana Bakur terora hov a nedîtitî bi awayekî gur û bêperwa wek salên berê îsal ji dom kir.

Ewrêñ tarî û giran ji destpêka sala 1994'an heta roja dawiya salê li asîmanê Kurdistanê neleqiyen. Bûyerêñ nexweş li duv hev, wek zîpîkê nehiştin çav li me vebe. Piça ronahiyê li me xuya nekir.

Teror Berdewam e

Wek sala 1992 û 93'an ev sala çûyî ji êrif û terora dewletê bi hemû hêz û hovîtiya xwe li Kurdistana Bakur dom kir. Dewleta Tirk di êrifîn xwe de tu sînor û bend nas nekirin. Şewitandin û wêrankirina gundan dom kir, hejmara gundêñ şewitî 2000'î derbas kir. Li gor agahdariyê Komela Mafêñ Mirovî di vê sala dawî de 1341 gund hatine şewitandin. Heta nuha hejmara gundêñ hatine şewitandin û wêrankirin bû 2115. Dewlet bi wêrankirin û şewitandin nesekînî, erîş û hovîtiyên xwe li bajaran jî domandin. Îsal careke din Licê wêrankirin; 230 dukan û 400 xanî ji alî hêzîn "ewlekari" ve hatin şewitandin. Bi milyonan insan ji ser erd û ava xwe rabûn, li gor hêz û taqet û karîna xwe bo xeribistanê rê girtin. Cînayetîn dewletê her dom kirin. Dewletê wek salên berê cînayetîn xwe wek "di şer de kuştî bi dest ket", "failê wê ne diyar", bi navê cuda cuda domand. Di sala çûyî de 281 Kurd, ji aliye dewletê ve bi navê failen wan nedîyar hatin kuştin. Di nav van kesan de ronakbîren Kurd yê naskirî wek Medet Serhat ku şahid û aktivistekî tevgera Kurd ya 40 salen dawî bû, serokê HEP'ê yê Ankarayê Faik Candan û yê Urfayê Muhsîn Melîk ji hene. Sala çûyî yek ji hedefen dewletê maldarêñ Kurd bûn. Behcet Canturk, avukatî wî Yusuf Ziya Ekinci, Savaş Buldan, Adnan Yıldırım û Haci Karay ji aliyeñ "kesen nenas" ve hatin kuştin. Sala çûyî 284 kes di bin çavan de wenda bûn. Hejmara kesen ku di bin çav de hatine kuştin 315 ye.

Dewleta Tirk terora xwe ya fikri di qada çapemeni û rewşenbîrî de jî domand. 1994'an de ji ber sedemêñ fikri dewletê 107 niviskar, rewşenbîrî û rojnam evan girtin, avêtin hefsê, 390 weşand civand. Di nav kesen girti de serokê Sendika Petrolê Munîr Ceylan, Doç. Dr. Fikret Başkaya, İsmail Beşikçi, Mehdî Zana, Ahmet Zekî Okçuoglu ji heye. Ji ber sedemêñ fikri-siyasi mehkeme 386 sal cezayê hefsê, 67 milyar 439 milyon lîra cezayê pera da. Xuya ye dilê dewletê bi girtin û cezakirina hefs û peran rehet nebûye ku di 3.12.1994'an de

avayıya merkeza Ozgur Ulkeyê û du buroyen wê bombe kîrin. Bîna merkezi ya rojnameyê hilweşya û xebatkarekî wê şehîd ket.

Ev reqamêñ li jor sînorê tevî dawîte û waran de pêşketin çênebû, lê di gelek waran de gelê Kurd çeper û prestij wenda kir.

Li Kurdistana Bakur terora hov a nedîtitî bi awayekî gur û bêperwa wek salên berê îsal ji dom kir.

Ewrêñ tarî û giran ji destpêka sala 1994'an heta roja dawiya salê li asîmanê Kurdistanê neleqiyen. Bûyerêñ nexweş li duv hev, wek zîpîkê nehiştin çav li me vebe. Piça ronahiyê li me xuya nekir.

Teror Berdewam e

Wek sala 1992 û 93'an ev sala çûyî ji êrif û terora dewletê bi hemû hêz û hovîtiya xwe li Kurdistana Bakur dom kir. Dewleta Tirk di êrifîn xwe de tu sînor û bend nas nekirin. Şewitandin û wêrankirina gundan dom kir, hejmara gundêñ şewitî 2000'î derbas kir. Li gor agahdariyê Komela Mafêñ Mirovî di vê sala dawî de 1341 gund hatine şewitandin. Heta nuha hejmara gundêñ hatine şewitandin û wêrankirin bû 2115. Dewlet bi wêrankirin û şewitandin nesekînî, erîş û hovîtiyên xwe li bajaran jî domandin. Îsal careke din Licê wêrankirin; 230 dukan û 400 xanî ji alî hêzîn "ewlekari" ve hatin şewitandin. Bi milyonan insan ji ser erd û ava xwe rabûn, li gor hêz û taqet û karîna xwe bo xeribistanê rê girtin. Cînayetîn dewletê her dom kirin. Dewletê wek salên berê cînayetîn xwe wek "di şer de kuştî bi dest ket", "failê wê ne diyar", bi navê cuda cuda domand. Di sala çûyî de 281 Kurd, ji aliye dewletê ve bi navê failen wan nedîyar hatin kuştin. Di nav van kesan de ronakbîren Kurd yê naskirî wek Medet Serhat ku şahid û aktivistekî tevgera Kurd ya 40 salen dawî bû, serokê HEP'ê yê Ankarayê Faik Candan û yê Urfayê Muhsîn Melîk ji hene. Sala çûyî yek ji hedefen dewletê maldarêñ Kurd bûn. Behcet Canturk, avukatî wî Yusuf Ziya Ekinci, Savaş Buldan, Adnan Yıldırım û Haci Karay ji aliyeñ "kesen nenas" ve hatin kuştin. Sala çûyî 284 kes di bin çavan de wenda bûn. Hejmara kesen ku di bin çav de hatine kuştin 315 ye.

Parlamenterê DEP'ê ceza girtin
Hovîtiya dewletê bi ezilkirina 14 parlamenterên Kurdperwer û girtin û cezakiri na 8 parlamenteran, li hemû dînayê belav bû. Roja 8'ê Çileya Pêşin mahkema 8 parlamenteran qedîya. Leyla Zana, Hatîp Dicle, Selim Sadak, Ahmet Türk û Orhan Dogan 15 sal, Sedat Yurttaş 7 sal û nîv, Sirri Sakîk û Mahmut Alinak 3 sal û nîv 7 meha ceza girtin. Li gel hemû protesto û daxwazê Ewrûpa û DYD, Türkiye ceza da parlamenteren DEP'ê.

Dewletê pişti HEP'ê, OZDEP û DEP û jî girt, wek berdewamiya wan HADEP hat damezirandin. Êrifîn ku dihatin ser DEP'ê, nuha tîn ser HADEP'ê.

Sê rojnameyên nuh


Sê rojnameyên nuh li nav çapemeniya Kurdi zêde bûn; Jiyan Nû, Stérka Rizgarî û Realite.

Ber bi yekîtiyên siyasi û rîexistinî

YEKBUN û PDK-Bakur
kongrên xwe yên duyem çekirin. YEKBUN û PDK-Bakur di sê saliyen xwe de du kongre civandîn. Ev yek di jiyanî siyasi ya Kurdistana Bakur de pêşketinê girtin.

Ber bi yekîtiyên siyasi û rîexistinî de sala çûyî hin gavên hêvidar û ber bi çav hatin avêtin. **YEKBUN, RNK û TSK** li ser xalêñ bingehîn yên yekîtiyên siyasi û rîexistinî li hev kîrin û di vî warî de ji bo raya giştî jî dokumentek hevbes belav kîrin.

Piştî vê gavê programek hevbes amade kîrin. Di 20'ê Çirîya Paşîn de **Kawa, Têkoşîna Sosyalist** jî tevî xebatêñ yekîtiyê bûn, her pênc hêzan bi hev re "Tespîten hevbes yê li ser awa û karekterê yekîtiyâ siyasi û Rîexistinî" kîrin û ji rayagîşti re bi beyanekê ve belav kîrin. Kar û xebatêñ yekîtiyâ siyasi û rîexistinî dom dike.



Gundêñ Kurdan hatin şewitandin û wêrankirin

e. Vê riyê ji roja ûlankirina Cumhuriyetê vir ve, şopa 70 salan li dûv xwe hiştîye.



Avahiya Ozgur Ulke hat bombekirin

Di bin serokatiya **Şerifetin Elçi**, Platforma Demokratik a Kurdi hat damezirandin. Platforma di rojîn pêş de dixwaze bibe partî.

Serê xwekujiye

Di statuya Kurdistana Başûr de tu guhertinê mezîn çênebûn. Kurdistana Bakur hîn jî di bin sîwana **Hêza Çakuç** de jiyanekê dawîya wê nedîyar diji. Wek salên berê sala çûyî jî hêzîn **Sedam Huseyîn** li Kurdistana Başûr diranîn xwe qîç dikirin. Türkiye, Iran û Suriye jî civînên xwe yê ka emê çewa bikin Kurdistana Başûr bifetisînîn domandin, dîsa wek gurra li dora Kurdistana Başûr dans kîrin.

Ji bo hemû Kurdêñ li ser rûyê dînayê bûyera herî xerab û tal ya salê şerî navxweyî yê Kurdistana Başûr bû. Du hêzîn sereke yê Kurdistana Başûr **PDK û YNK** sala çûyî du caran şer kîrin. Şerî pêsi di destpêka Gulanê de li **Qeladiza** dest pê kir. Pirşirêkê li ser erd ku du malbat anîn hember hev bû bahana şerî, sedema esasî reqabeta hişk û **ezîtiyâ partîstîyê** bû. Piştî ku zêdetir ji 1000'î pêşmerge hatin kuştin, bi tehdîda qutkirina alîkariyê DYD û dewletêñ Ewrûpî şer rawestîya. Hêvî ew bû ku careke din ev şer dubare nebe. Lî tîrsa me bû rastû, di meha dawîn ya salê de careke din şer di nav her du hêzan de dest pê kir. Wusa xuya ye her du hêz jî vê carê bi hazirî ne û bi hêrs in.

NEYNIK

Serokkomarê Kurdistana Federe

S. Bengîn

Sala 1994'an li gelek deverên dînayê ji bo mirovan bi êş û xwîn derbas bû. Bi sedhazaran mirovan kuştin û bi milyonan jî wa-ren xwe hatin derxistin. Çemîn Rwandayê bi xwîna insanan sor di-herikîn. Li Yogoslavyaya kevn, kî giha kê, hevûdu kuştin. Kurdistan jî yek ji wan herêmîn dînayê ku bi agireki xaîn dişewitî, mirovî le dihatin kuştin û talan dibûn.

Lê berî ku sala 1994'an biqede, mirovayetiyê, qet nebe hînek ji wan kesen ku li Rwandayê bibûn sedemîn kuştina nîv milyon insanan derxist holê û biryar da ku ew kes bêñ girtin û derkevin pêşberî dagdîha Laheyê. Hînek kesen wilo jî li Bosnayê hatin kiş kirin. Lî qatîlîn Kurdan, ya qehreman in ya jî parastî ne.

Dema sala 1994'an li ber xelasbûn bû li hînek derîn dînayê ku şer lê li dar bû û agir dibariya, serê hînek hêviyan jî xuya dikir. Mirovîn berê xwe dabûn wan hêviyan û li bendî salê bêsebir dibûn. Mirovan hêvî di sala nû de didîtin û xwe bi hêviyan sala nû amade dikirin.

Lê mixabin dema serê sala nû xuya kir. Kurden Başûr di bin ala keleş û xêrnxwazan de bûn du bes û bi sala nû re şerîkî kambax li dar xistin, bi milyonan Kurd xemgîn û bêhêvî kirin. Ew hêviya ku wek guleke buhara derengkei nû li başûrê bi xwînê û hêsiyan şîn bibû, ji dijminan re dîsa qurmiçandin. Herdû aliyan, wek dema İskenderê Mezin welat digirtin, girtin ser bajaran û bajar ji hevdû safi kîrin. Tê gotin ku "aşû, bi vî awayî baştir tê damezirandin". Ci şermezârî ye! Ü ji bîra nekirin ku wek di hemû şerîn kevnar de iro jî girtina paytextan pir girîng e. Loma jî şerîkî giran li ser paytaxtê Kurdistana Federe kîrin. Erê rast e, bi sedan pêşmergîn me ji hevdû kuştin, bi hezeran reben ji ber nigîn wan yîn qirêj çûn, lê di encama vî şerî giran de, aliyeke, û din ji paytaxtê derxist. "Edî wê xelkê paytext baştir bê kontrol kîrin. Edî wê diz nema karîbin diziyê, cepel ji nema karîbin çepeliyê bikin."

Dema şer li dar bû, Parlamentoya Federal bi rojan daigirtî ma, heta ku dûrê parlamenten reben di bin devê tivingan de wek qirdiqen sersalan ji parlamentoyê hatin derxistin. Lî serokê parlamentoyê ji aliye û din bû, loma ji ew ket destan û hat girtin. Dûre hat berdan. Lî ecêb e, heta wê çaxa ku hat berdan jî neker bîra tu kesî ku ew camêr mezinî wî welaşî ye, ji bedela serokkomarê Kurdistanê ve ye, tu kes nikare wî bigre! Lî girtin, mirovî ji bedela serokkomarê Kurdistanê ve kîrin qesmer û bi çol û çiyan xistin. Mixabin a nuha ewî jî kîncîn leşkeran bi bejn û bala xwe dakirine, di nav seroktiya leşkeren aliyeke de ye.

Serokê parlamentoyê anîha, ji bedela ku parlamentoya xwe li ciyekî din gazî civînan bike, ji bo ku karîbe vî şerî keleşan rewestîne li riyan bigere û biryâdarî ji herdû aliyan re bêje "hûn kîne kû hûn radibîn vî şerî ne qanûnî li welaşî min li dar dixin, parlamentoya min digrin, nahêlin em karê xwe bikin û welaşî xwe idare bikin, hûn radibîn bajarêñ ku hûn lê xurt in karmendin min ji kar

Dûmahîk r.11

Li gor agahdariyan di vî şerî dawî de heta nuha li dor 500 pêşmerge hatine kuştin.

Avayiya Kurdistana Başûr li ser mil û hevkariya PDK û YNK ava bû. ji ber vê yekî şerî her du hêzîn jiyan û hebûna avayiya nuha ya Kurdistana Başûr dike xeteriyê.

Li Kurdistana Rojhîlat û ya Başûrê Rojava di sala 1994'an de tu guhertinê mezîn çênebûn. Zulm, zordestî û terora dewleten serdest li her du perçeyen welaşîne me jî qet kêm nebûn. Li ber çavê dunyayê **rejima melleyan** li Iranê û bi taybetî jî li Kurdistana Iranê mafêñ mirovî di bin linjan de wesle wesle dikan. Li gor nûçeyen dawîn li Kurdistana Roj-

hilat jî rejima melleyan dest bi wêrankirin û şewitandin gundêñ Kurdan kirine. Tu deng ji dînayê dernayê.

Li Suriyê ku 24 sal in eynî şexs, eynî mentalitet li ser hukum e û di her hilbijartînê de sedî 99 deng dîgrin hebe, wê di rewşa Kurden wê de re de ci guhertin karîn çebîbin? Periyoda berê di meclîsa Suriyê de 3 parlamenten Kurdistana Başûr hebûn, di hilbijartînê isal de dewletê rê neda wan.

Bi kurtî sala 1994'an saleke ewrtañ û xerab bû ji bo me Kurdan. Hêvî ew e bi vî hêla xwe jî sala 1994'an li dûv sala 1995'an bimîne.

Mîrza Bextiyar

RAMANÊN RAMANWERAN

Esîr û Netewe

S. Roşan

Ci mixabin, di civaka kurdan de hîn jî giraniyi pêwendiyen esîr û esîrî, li ser bûyeren ku li Kurdistanê rû din, heye. Esîr di civaka me de, bi taybetî li derveyî bajaran, ci di nav civakê, ci jî di têkiliyên siyasi de roleke mezin dilizin. Esîr fenomenekê civakî ye. Di nav civata de pişti malbatê derecaya duhemîn digire. Li gelek de veran vê fenomenê prosesa xwe ya tebî buhurandîye. Rola vê fenomenê li civatê sinai, yên ku sentralizma xwe pêk anîne, dewletêne xwe yên millî ava kirine, bi şeweyekê gelempirî di warê fikrîn neteweyî de civata xwe perwerde kirine û li bajarêne mezin bi cih bûne, winda bûyc. Lî berafajî vê, civatêne ku di vê prosesê re derbas nebûne, an jî berî bîghêjin vê qonaxê, tûşî dagirkirinê mane, rol û rewşa esîran bi awayekî din xuya dibe.

Herçend dê kaffî nebe jî di vê kurtenivîse de, di çarçoweya pîrsa neteweyî û siyasi de ez dê li ser rola esîran rawestim. Erê ferdîn esîran li pîrsa neteweyî çawa mîzedikin, di xwezanîna wan de hesîn millî û xwezanîna netewî hene an na? Gelo cîma li welatê me, civaka me esîreke bi hezaran kesen xwe ve dikare bikeve rewseke beravaji realiteya xwe ya neteweyî (etnîki) û her eynî esîr pişte demekî vêca li dijî neyarêneteweyâ xwe serî hilde? Ev fenomen li welatêne din çawa ye, esîret mîna fenomenekê civakî li welatêne ku ew lê bi hêz e ci rolê dibîne û di harmoniya civakê de çawa dihele.

Bi gelempirî

Bi gelempirî netewe û civat di

qonaxêne esîrî, feodalî û hwd rederbas bûne. Ji ber rewşen guhertî yê civakî, aborî, kultûri, siyasi, cografi û hwd, fenomena esîrî li her derê di demeke kurt de ji hevneketiye û derbasî derecyeke bilind nebûye. Li gelek welatan esîr hîn jî bi şeweyekî xurt di jiyana civata de xwediyen rolekê ne. Ev fenomen hema hema li hemî welatêne nesina xuya dibe. Wek nimûne: Esîr bi xurtî li Afganistan, Kurdistan, Iran, Afrika û dewletên Ereban hebûna xwe idomînin.

Avabûna dewletên neteweyî teqabulê sentralizmî dike. Ji ber vê yekê gava neteweyek sentralizma xwe pêk dihêne li gora rewşa xwe ya civakî ji hin merheleyan derbas dibe. Dewletêne heyî bi xurtbûna sina, perwerdekirina navendî û briyîn askerî hebûna esîr û feodalizmî ji ortê rakirin û radikin. Li hin cihan ev bi awayekî nerm li hin deveran ji gelekî hişk û bi xwîniranê hatiye pê; ev proses aloz e û li ser wextekî fireh raxistîye. Welatêne ku tûşî dagirkiriyê bûne pirsgirêka esîrî, berê ku ew welat sentralizma xwe pêk bihînîn- bi şeweyekê dî xwe nîşan dide. Mirov dikare vê yekê di bin cend nuqteyan de dest nîşan bike.

Dewletêne dagirkir ji qelsi û lawaziya welatê ku dagir dikin sôd werdigrin, li dijî berjewendîya civata zorbîri nakokiyen civakî ges dikin û civata ji hev dixîn.

Dagirkir dixwazin kultur û awayê jiyana xwe li nav civata bindest bi cih bikin û asîmîlasyonê dixin jîyanê.

Ji ber fenomena esîrî, mirovên esîran, esîrî weke "netewe" telaqî dikin; lewra di çarçoweyeke fireh de li meselê mêze nakin. Ango xwe parçeyeke ji wî neteweyî, ji wî kultûre, ji wî zimanî, ji wî welatî bi awayekî pêwest nabin. Ji xwe gava ew xwe beşekî netewe, kultûr, ziman û civata bibînin û ev dîtin di nav

Ji ber rewşa me ya civakî, kultûri, siyasi, herweha dagirkirin û parçebûna welatî, li hember vê û her fenomenen ku di civata me de xwedî rolekê ne, em mecbûr in bi diqet bin, da ku helwesta me ya siyasi ji kêm-dostan re meydana ji hevxistina civaka me veneke. Lawazî û qelsiyen ciwakî me kûrtir û berfirehtir nebin.

wan de bi laş û gewde bibe esîr ji eşîriyê derdikeve.

Li Kurdistanê

Dihete zanîn, li gel hin ferqiyan, bêîawarte li hemî parçeyen Kurdistanê fenomena esîrî li ber çav e. Di civaka kurdan de, esîr xwediyen giraniyeke mezin in; girîngî û giraniya xwe li ser bûyeren siyasi yên li Kurdistanê diqewimin didin hîs kirin. Ev ne pirsgirêke rojane û nû ye. Ev yeka han ji sedsalan û vir de her li ber deriyê kurdan e. Di tarixa kurdan ya kevin de li gel rola negatif roleke wan ya pozitif ji hebûye. Di parastina adet, ziman û folklo-ra kurdî de roleke pirr girîng leyistîne. Ji kultura dagirkirana bidûr, li serê çiyan, li kûrahiya newalan jiyana xwe domandine; û vî şeweyê jîyanê ew ji asîm-

lasyonê parastine. Di pirtûka xwe ya bi navê Kurd de Bazîl Nikitin li ser rewşa esîran û ferdîn wan weha dînivise: "Kurdî nav adet û qâideyîn esîrî de hatiye stirhandin (hevirkirin). Ew, di warê şexsiyet, ziman, adet û toreyen xwe de deyndarê esîra xwe ye; herweha zihniyeteke teng ji eşîretê wergirtiye. Ev zihniyeta teng dibe hoyê nehizirkirin û avakirina dewleteke millî." (ÖY. Yay. s. 314-15)

Di ser fikrîn Nikitin yên jorîn re geleki wext derbas bûye. Civata kurd ne ya 50-70 sal berê ye. Di hemî waran de guherînen mezin pêk hatine. Digel vê yekê weke me li jor ji nîvisi di civata me de rola esîran neşîkestiye.

Ji vê tesbita Nikitin ji diyar e ku ferdîn esîran bi awayekî hevdem nehatine û bi hêsanî nayêne perwerde kirin. Helbet hoyen vê yekê hene:

- Berî ku pirsgirêka esîrî bîhîte çareserkirin, civaka kurd û welatî wan hatiye dagirkirin.

- Bi gelempirî derengmayîn û nexurtbûna pêwendiyen bajarvanî li Kurdistanê.

- Ji ber tunebûna dezgehîn navvîn yên neteweyî civaka kurd bi hest û fikrîn nişîmanî nehatiye perwerdekirin û xwezanîna millî bi giştî ne kamil e.

- Xwendîn û nîvisîna bi zimanê biyaniyan, herweha tunebûna dem û dezgehîn weşanê bi zimanê kurdî; û asîmîlasyon, bûne hoyen lawaziya hesten neteweyî.

- Girtina berjewendîyen esîrî li pêş yên neteweyî û nakokiyen nava esîran û hwd.

Heger em li serhildanen kurdan yên ku li dij dagirkirana mîze kin, dê diyar be, ku ji ber van hoyen jorîn esîran geh li vî alî geh li wî alîyî cih girtine. Ev ji ber fenomena esîrî bi xwe dihêt. Lewra ji bo ferdîn esîrî parastina esîrî girîng e. Ferdîn esîrî zanîna xwe ya destpêkî ji esîrî werdigrin. Ev perwerdekirina wan ya di vî warî de, şopeke girîng û mezin li ser pêşeroja wan dihêle. Gava di nav de esîran de gelseyek derdikeve holê, her ferdekî esîrî xwe mecbûrî parastina esîrî xwe dibîne. Mercen civakî, têkiliyên esîrî û yên iktîsadî wan ber bi vê biryareh dehf didin. Li hember dagirkirana ji her helwesta wan di vê

çarçeweyê da ye. Herçiqas di navwan de cewazî hebe jî, lê bi gelempirî helwesta wan mîna hev e.

Fena me li jor ji nîvisi li Kurdistanê, di nav civata me de ev rewşa han reel e. Ji ber vê yekê mirov mecbûr e di xebata siyasi û şeweyen têkoşînê de vê realiteya civata li ber çav bigre. Bi inkara pirsgirêkê, an jî bi şeweyekê sivik li ser pîrsî hûr bûn her zirarê dide doza neteweyî, tevgera millî û demokratik bîmecal dixîne. Bi paşverûtiyê binavkirina vê fenomenê meseleye çareser nake; berevajî, yekcar pirsgirêkê tevlîhev dike û ji neyaran re meydânî fi-rehtir dike. Baş e li hember vê divê helwesta mirovî ci be?

Helbet pîrs ne hêsa ye. Lewra bersivek basit ji nîne. Yen di ferhenga xwe de ji bo çareserkirina gelşeyen civakî ji her pîrsî re bersivek hazir dibînin, di çareserkirina pirsgirêkan de helwesteke teng dîgrin. Ji xwe pîrê caran ji ber bêhntengî û bêtoleransiyê guhdariya civata an ji tu kesî nakin. Ya xwe dibîjin û şeweyen hişk yên ne di berjewendîya civata de bi kar dihênin. Ev jî dibe hoyâ bîmecaliya civakê, gelşeyen civakê zêde û berfireh dibin. Bi van riyan çewt mercen çareserkirina hin pirsgirêken civakê ji holê radibin. Lewra şîara "an her tişt an jî ne tiştek" di xebata siyasi de pûc e. Zede ehemiyeta wê tuneye. Bidestxistina daxwazan girêdayî xurîtbûna mirov ya di nav civata de û rewşa giştî ye. Fêdeya re-torîka siyasi, ne dûr e di warê propagandeyê de hebe, lê di jîyanê de, di çareserkirina pirsgirêken civakî de tu ehemiyeta wê nîne.

Ji ber rewşa me ya civakî, kultûri, siyasi, herweha dagirkirin û parçebûna welatî, li hember vê û her fenomenen ku di civata me de xwedî rolekê ne, em mecbûr in bi diqet bin, da ku helwesta me ya siyasi ji kêm-dostan re meydana ji hevxistina civaka me veneke. Lawazî û qelsiyen ciwakî li dijî menfaeta civat û neteweya me kûrtir û berfirehtir nebin.

Di vê çarçoweyê de rola bijartina şeweyen têkoşînê pir girîng e. Di serhildanen kurdan, ci yîn kevin û ci jî yîn dema nêzîk de, rola

Dûmahîk: r.11

Huner û Hunermendî

Afirandin du car jîyandin e.

Lokman Polat

Yen ku mirov li ser lingan, li pîyan dîgrê hêvîya mirov e. Lewra mirov sembola hêvîye, rûmetî û di berxwedayînê ye. Hunera ku hêvîye û berxwedanê bi kar neynê qîmeta wê zêde tûne ye. Hewcedariya ji hunerê re ew e ku huner divê valahîye tîji bike. Huner cihanê dinase û di nav mirovan de pêşveçûnî dihonînê. Di nav civata de hîsîk etîk belav dike. Huner bi xwe navgîn e. Mînakîn jîndar e.

Hunermendî di eslê xwe de pîratîka xweser a afirandinâ berhemîn civakî ye. Ji bo guherandinê, ji bo pîrs û pirsgirêkan, ji bo çareserkirina pîrsan, wezîfîn mezin dikevî ustîyê hunermendan. Wek ku Tolstoy jî dibêje:

"Her rojîn nûh, wezîfîn dîroka divê. Em jî, yan emê li pey vê wezîfî mîze kin û yan jî vê wezîfî qebûl bikin."

Hunermend û kadirêne siyasi yên gelê Kurd divê mîjîyê xwe biguherîn, modern bibin. Cîvakekî pêşketî û modern bi dîtin û ramanen nûjen tê saz kirin. Çawan ku gelê Kurd layiqê koletiyê û bindesiyye nîne, weha jî layiqê sazumanekî kevnare, paşverû û dîktatorî jî nîne. Gelê Kurd ji alî dagirkiran ve pirr hatiye pelçiqandin.

Jî bo vê jî, divê hunermend bi wezîfî xwe hayîdar be, berpîrsî-yarıya xwe baş bizanibe. Di têkili û pirîn civakî de bi çavekî rexnegirî li pêvajoya binêre. Mirovîn hunermend û afirandinê wi/wê ji civaka ku tê de dijî nayê vejetandin. Dîtin û ramanen wi/wê li gor têkiliyên civakî, maddî, manevî, aborî û siyasi bi şekil bigre. Berhemîn hunerî li gor têkiliyên civakî yên taybetîn afirandin. Ji bo ku guherandinê têkiliyên civakî di hêla estetik e.

Ger mirov pêvajoya dîroka hu-

nêrî nîzânibe, hunerê baş fêm-nake. Huner bi civakbûna mirovan dest pê dike. Dîroka hunerî bi qasî dîroka mirovatiyê kevn e. Lî di her demî de, li gor demê hatiye guherandin, xwe nuh kiriye. Hunera her demî hem berdewama a berê ye û hem jî ji a berê cudatir e. Di pêvajoya dîrokê de her dem guherandin çê bûn, lê ev guherandin bi hev û du ve girêdayî bûne. Ya ku ev têkili û girêdayî çêkiriye çanda mirovahîye bûye. Berhemîn ku bi çend mirovahîye ve nehatiye girêdan helîlaye, çüye.

Di her demî de hunera wê demê hatiye çêkiriye. Hunerîn her demî ji hev cûda bûne. Dîtin û ramanen her demî li gor wê demê hunerê nûh afirandiye. Nûhkîrîna hunerî a her demî, cîhana cûda cûda dide xwîyakîrin. Hunera Grekîyan a qedîm yan jî hunera Misrîyan a kevnare û hunera nûha ji hev û du gelek cûda ne.

Huner afirandinâ dîyake nû ye. Huner me fêri jîyandinâ dîyake nû helwesta famkirin û guherandinê dike. Huner xwestineke afirandinê ye. Xisusiyeta huner-

mendîye bi daxwaza xwe guherandinâ dînyayê ye.

Ji bo netewen bindest hewcedariya huner û hunermendiyê gelek heye. Afirandinâ hunera netewayî li ser hîmîn kevnare na, divê li ser esasen hemdemîyê, nûjentiyê be. Hunera modern di civakan paştemayî de ji tê afirandin. Nakokiyen civakî û netewayî ji bo pêşketina hunerê dibe zemîn. Dîtin û ramanen modern bi xwe re hunereke modern jî derdixe holê. Huner li ser van esasen modern hîn jî pêşde dike.

Jîyandin û guherandin di pêvajoya civakan de zû bi zû ber bi pêş dike. Cîvak wek xwe namîne, tê bişkavtin. Di guherandin û pêşveçûnî de huner rola xwe dileyize. Avakirina dînyayeke nû bi xwe re avakirina hunerek nû jî tînê. Hunera ku di xwe de dînyayeke nû çeneke, di pêşerojê de dahuuya wê tune ye. Gava dahatuya wê tûnebe dînyâ nuh jî nabe. Wexta ku huner ji xwe re dînyayeke nuh afirand xwe jî nuh ve diafirînê, vedijîne.

Dûmahîk r. 11

Çûna Barzanî bo Sovyetistanê


Li ser çûna Barzanî bo Sovyetistanê gelek maqele û hin pirtûk hatine nivîsandin. Berî du hejmaraan bîraninên Pavel Anatoliyeviç Sudoplatov li ser çûna Barzanî bo Sovyetistanê di vê rûpelê de cap bûbû û hin tişt ron kiribûn.

Di Tebaxa 94'an de min li Dihokê Buraya Rojnameya PEYMANê ziyaret kiribû. Li vir sernivîskarê rojnameyê Edîb Nadir ez bi Siddiq Bexsî Ehmed dan nas kirin. Siddiq Bexsî yek ji wan kesan bû ku di sala 1947'an de bi Mele Mustafa Barzanî re çûbû Sovyetistanê. Siddiq Bexsî pîr bûbû û guhê wî giran bûbûn, hîn pîrsen min baş fehm nedikirin û car carna jî gotinên Rûsi bi kar dianîn.

Li ser çend pîrsan min pê re hevpeyyînek kir û hevpeyvinê xist babetê nivîsê.

Bi baweriya ku ev nivîs hin bûyarên dîrokî ronitir bike.

Halîm Can



Siddiq Bexsî Ehmed (Foto: Armanc)

Siddiq Bexsî Ehmed (yek ji hevalê Barzanî bû ku pê re çûbû Sovyetistanê)

"Li Sovyetê neheqî li me hat kîrin"

Em di sala 1947'an de çûn gundê Ertûş, ji wê çûn gundê Dirê ji Dirê jî em çûn Bêdavê. Bêdav gundekî wisa ye ku nîvî axa wê dikeve nav sînorê Tirkîyê, nîvî din jî dikeve nav sînorê Irâqê. Wê gavê merivekî me birîndar bû. Mele Mistefa tivingeke birno da merivekî zîrek û got, "vî mîrovî muhafize kin, teslimî Tîrkan nekin." Ji wê em çûn deşta Bêdavê, deşta Bêdavê ya ku bi berf bû ji berfî em nikarîbûn derbas bibin me bi şîşê tivingê xwe rî vekir em derketin nav Tîrkan gundekî dibêjin Bahê, em çûne gundê Bahê li wir em ezibandin û qedrekî mezîn dan me, ji wir em çûn Geverê û ji çiyayên Geverê me xwest derbas bin. Hevalên şarîza li gel me hebûn em bûn du grûb û wiha çûn Sovyetistanê.

Em hemû 530 kes bûn. 30 kes telef bûn em 500 kes gîhîstîn Yekitiya Sovyetê.

Em çûn Nahçıwanê. Em 40 rojan li Nahçıwanê man. Doşeka me erd, lihîfe me esman, bâlîfka me berd bû. Nan û xwarina me girara garis bû. Carna masî jî didan me.

Piştî 40 rojan emrek hat, seyare ji bo me rîkirin, wek eskeriyê her 30 nefer kîrin rîzék û em birin bajarê Akcebedî. Li vir em belav kîrin. Hindê Mele Mistefa, Şêx Silêman, Eliyê Mihemed Siddik û Mirhaç şandîn Bakûyê, paytaxta Azerbeycanê. Em yêndin birin gundekî, muxtarîn gund hatin, yekî got, "Ji min re 4 nefer lazim in", yekî got; "ji min re 10 nefer lazim in" bi vî hawî em belav kîrin. Grûba me 5 kes bû; Bawê Azad Berwari; Mihemed Efendî, Ebdurrehman Muftî, Cemîl Tewfîkê Bamermî, birayê min Salih Bexsî û ez bûm. Em 5 kes birin gundekî, li vir erzaqê me didan me, zadê me didan me. Me got; "Welle ev xweş jiyan e".

Piştî 3 heyîvan rojekî mezinê gund hat, kitêbek di destê wî de bû û li ser bergê kitêbek bi Rûsî

wiha nivîsbû; "Kto rabotî tut yes, kto ne rabotî yes net", Yanî mahna wê ew bû "yê ku kar bîke kare bixwe, yê ku kar nake jê re xwarin nîne". Me got; "baş e, emê ci karî bikin?"


Ji min û Cemîl re gotin; "ém pemû dicinin, hûn herdû dê bêñ vî karî bikin". Salîh birayê min hespekî dan wî, ew jî bû kontrolciyê me da ku kes xerabiyê neke. Ebdurrehman Muftî kîrin heras da ku golik û pez neçin giya nexwin. Mihemed Efendî jî kîrin herasê ku kes tiştan nedize. Me sê heyîvan ev kar kîrin.

Rojeke wezîrê wan li gel Şêx Silêman hatin gund, ji me yekî re du dest cil hanîn û hînek pere dan me, û gotin ku wek ku em dixwazin dî di nêzîk de karê me çêbe.

Rojekî mezinê gund hat heywanek bo me şerjê kîrin, serê merivê 5 kîlo peynîr dan û 50 hêk dan me û gotin; "emrek hatiye hûnê sibê herin Bakûyê". Roja din bi trêne em birêkîrin, em çûn Bakûyê. Em birin hemamê; me xwe şûşt, me riyêñ xwe kur kîrin. Wextê em ji hemamê derketin; zabiteki wan hat ji me re got, "cîlêñ xwe li xwe nekin" û yeko yeko navêñ me xwendin. Yêñ ku zabit bûn cîlêñ zabit dan wan, yêñ ku cîndî bûn, cîlêñ cîndîyan dan wan. Em wexta ji hemamê derketin derve, kesî ji me kes nas nedikir. Hemû cîlêñ eskerî li wan bû. Li wir em birin merasimê, ji me re merasim çêkîrin, her tişt hazir e. Livînê me danîne, metemâ me danîne û hemû tişt bi ser û ber in. Mele Mistefa jî li cem me bû. Ew wê gavê li Bakû yê bû.

Em bi zabite Rûsan re tedbirê dikin. Amirekî wan, yek yê me hebû. Em 500 kes bi hev re tedbirê dikin. Zimanê tedribê jî Rûsi, Kurdi û Azerbeycanî pêk dihat. "Geriye dön, sola dön, saxa dön"; bi zimanê Kurdi jî ji me re tercuman anîne, zabitewan jî dibêjin hûn bi Kurdi tedrib bikin. Me du sal eskerî kîrin.

Piştî du salan, tade li me ki-



Mustafa Barzanî li Amerîkayê (1979) (Ji arşîva Beşîr Botanî)

rin. Dîsa me tewzîh kîrin, Mele Mustefa birin sê salan nîşanî me nedan. Me nîzanîbû ew sax e yan mirî ye. Û em jî ji hev belav kîrin, her yek avêtin mintiqayekê. Bijartîn 10 nefer li vir, 20 nefer li vir bi wî hawî em belav kîrin. Me sê salan li hember hukûmetê mîzehere kîrin. Em neçûn dewamê, hatin ser me, debance li me kîşandin, me debancen wan ji wan stend û şikand. Hînek ji me girtin, ifadêñ me stendin. Gotin "we çîma wilo kîriye", me got; "em serokê xwe dixwazin".

Melle Mistefa sê salan berze bû. Em Melle Mistefa dixwazin. Tu çareyê wan nema mecbûr man piştî sê salan dîsa Mistefa Barzanî anîn nav me. Me xwend û em çûn medresan. Piştî medresan qîsmek ji me birin beşê siyasetê, qîsmek zîraetê, qîsmek mihendîsi xwend. Min bi xwe beşê zîraetê xwend. Nuha ez teqawut im. Ev hedikêt Dihokê hemû min çêkîrine. Aîla min jî jînikeke Rûsi ye. Ez wê gavê 24 salî bûm. Pîreka min xelkê Kirim e.

Mele Mistefa ji me re digot, "Min ci hal nema, ez şevekê nîvîstî bûm, berê xwe didime zabitekê fener destê wî de ye, betaniya min li ser min bilind kir, da binêre ez ci dikim. Debanceyek destekî wî de ye û lembe jî di destekî din de. Barzanî li ser vê pirr aciz bû û got; "min jî desîte xwe avêt tebancê, min bi herdû desten xwe wî girtin û ew daf da, ew çû li dîwê ket û debance jî destê wî ket. Min danî ser kursî. Min deriyê xwe qifil kir û ez nivîstim. Ji qehra xew neket çavê Barzanî.

Mele Mistefa temsîla qewmekê dikir û 500 mîr li gel wî bûn û wan 500 kesan ji bo wî xwe fedâ kiribûn. Mistefa Barzanî dom dikir digot," roja din ez neçüm kar. Li oda xwe mam, min bihist yek li deriyê min dixe, min derî vekir, zabitekî ji me li gel zabitekî din û zabite kuvarev min debanceya wî jê wergeribû, her sê ketin oda min." Gotin "Em karin bêñ hundir" Barzanî gotiye "fermo". Barzanî digot, "di odeya min de tenê textek û kursîyek hebû." Ew hersê li ser text û ez ji li ser kursîyê rûniştîm. Gotin "em karin dabanca xwe rakin" Barzanî gotiye "kerem kin". Debanca xwe rakin. Navê zabit Mamedov bûye. Mamedov gotiye, "min efu bike, tembiyen hukumeta İngiliz û Amerîkiya ew e ku Mele Mistefa ne mirovî demokrat e û li ser demokratîyê şixul nake, hukumet jî mecbûr e icraatîn xwe bi cî bîne, bes hate wucude ku tu merivekî demokrat û temsîla qewmekî dikî. Rabe Stalîn gotiye bila bê Moskovayê. Li tiyârî siwar dîbin, diçin Moskovayê.

Stalîn dibêjê; "te bo ci malûmat ji me re nenivîsî". Barzanî gotiye; "min ni-vîsî, ji vê tarîxê min nivîsiye, beria Reis Wezare binêre". Bêrîka wî, kabîneta wî saxkirine, mektubîn wî hemû haciz kirine, nedane Stalîn. Li vir gotiye Mamedov ci tiştê tu bêjî ezê ya te kim. Ew zivirandin ciyê berê.

Dîsa medrese bo me vekirin. Seet şeşê sibê de diçin dewame, piştî nîvîro 4 seetan me dişînîn mektebê. 4 seetân xwendînê jî wek kar ji me re hesap dikirin û pereyê me didan me. Hate sala 59 an yê min du derase hebû. Ew yêñ hukumet bûn, lê ez li ser muşrif bûm.

Rojek jina min hat ber min ji min re got:

- Tu zanî ci bûye?

Min got:

- Ez ci zanîm ci bûye? Ez serê sibê zû radibim û heta êvarê kar dikim.

Wê digot, radyoyê gotiye ku li Iraqê încilab çêbûye, Melîk kuştine. Hukûmet dibê bila Mele Mistefa vegere Iraqê. Min got ev xweş e û fêda me tê de heye. Mîrhec û Eshed hatin Baxdayê, carekê din zîvirin hatin Sovyetê. Ji bona me muamelêne me çêkîrin. Em hemû dîsa zîvirin, lê bawer im 6-7 kes nezîvirin heta nûha jî nehatine. Em hatin Basrayê, Ereban jî bo me muqalebe kîrin em birin Baxdayê. Wesfi Taha yê ji hukumetê hat pêsiya trêna me, xwîşka Abdulkerîm hat. Em hatin Selhedîn em li vir du mehan man xanî dane me. Hukumeta Abdulkerîm qiymeta me girt û mîletê Kurd jî qiymet da me.

Zimanzan Reşo Zilan:

”Di Kurmancî de ji bo tiştên abstrak gotin dîtin gelek zehmet e”

Di 5-12'ê meha 11. a 1994'an de li Stokholmê civîna Enstituya Kurdi ya Parîsê ya li ser zaravê Kurmancî çebû. Endamê Redaksiyonê S. Rêving bi zimanzan û yek ji besdarê civînê Reşo Zilan re li ser civînê Kurmancî û pirsgirêkên zarava Kurmancî peyivî.

Armanc: Kak Reşo di warê Kurmancî de hetâ nuha çend civîn hatine çêkirin?

R. Zilan: Civîna li ser zavarayê Kurmancî yê ku Enstituya Kurd a Parîsê li dar xistiye 16 ne. Civîna yekemîn di sala 1987'an de li Barcelonayê çêbûbû. Salê du civîn çedibin yek Biharê yek jî Payizê çêdibe. Her civîn heft rojan dajo.

Armanc: Encamên civînê di rojnameya Kurmancî de çap dibin heta nuha çend hejmarê Kurmancî derçûne?

R. Zilan: Heta nuha 13 hêjmarê Kurmancî derçûne û du hejmar jî li ber çapê ne.

Armanc: Armancê van civînan ci ne?

R. Zilan: Yek ji armancê Ensîtuya Parîsê ev bû ku bala xwe bide ser ziman û edeba Kurdi. Di vî warî de bixebite ku zimanê Kurdi pêşve bixe, di wî warî de kitêban derxe. Bixebite ku zimanê Kurmancî di nav milet de belav bike û jê re normek nivîsandî bibîne. Yanî ji Kurmancî re standartekê bibîne. Ji ber wê pêwîstî hat dîtin ku ne bi cureyekî fireh be jî, birêya pisporê ku di warê zimen de xwediyê zanyariyeka ilmî ne, di warê cihê cihê de kar kirine ku ne bi vê rewşê be jî di nav me Kurdan de ev kes bêli ne ew karin di hinek waran de ji bo pêşvexistina zarava Kurmancî bixebitin. Ew digihêjin hev û di hinek waran de ew dewlemdîya ku di Kurdi de heye bigîhê neticeyekê û encaman wan belav bikin.

Armanc: Pîvana pêşdar-bûna civînan ci ye, ew kesen ku bêşdar dibin hûn çawa hildibijérin?

R. Zilan: Di destpêkê de pîvana ku hatibû danîn ew bû ku hevalênu bi taybetî li ser zimanê Kurmancî kar kirine, li gel wan hevalênu bi nivîskar in û her weha hevalênu bi karê weşanen mijûl dibin. Ev heval diyar in. Hevalênu bi nivîskar in dikarin di hin waran de û haziriya ku li ber wan heye pêşkêsi civînan bikin. Hevalênu bi rojnamevan û xwediyê weşanxanan in ew jî dikarin di warê çapemeniyê de, nivîsandin û pirsên din de pirsgirêkên ku heye pêşkêsi civînan bikin.

Lê mixabin dive ku ez viya bîbêjim ku gelek ji wan hevalênu bi wexta xwe de hatibûn û yan jî



Bîstikek ji civîna Kurmancî (Foto: Armanc)

Zarava Kurmancî di hinek waran de dewlemdend e ji bo hinek tiştan meriv dikare 10-15 sînonîman peyde bike. Bo numûne di warê çandinîye de ji bo gulekê ji bo heywanekî meriv dikare 10-15 navan bibêje. Di warê jiyana koçeriyê de, di warê heywan xwedi kînî de, di warê evîniyê de meriv dikare pirsê zelal bibine. Lî di warê tiştên abstirak û terminolojiyê de gotin dîtin gelek zahmet e. Di sedsala me de pêşdeçûna teknolojiyê gelek li pêş e; di warê cihê cihê yê teknolojiyê de, di warê zanîstî de pirs derdikevin pêşîya me, ji bo wan jî termoloji pêwîst e.

gelek hevalênu din ku diviyabû besdarê civînan bibin nehatin. Sebebê nehatinê ne ew bû ku heqê rîya wan tunebû; ji ber ku me di destpêkê de gotibû di vî warî de em alîkariya wan dikan. Em dika-rin bibêjin ji ber tembeliyê nikarin besdarê civînan bibin ya dudu-yan jî bi baweriya min mesela fedekariya 15 rojan e. Ji alî karê xwe û taflîa xwe de fedekarî bikin. Bikarîbin 15 rojên xwe feda bikin ji bo Kurmancî. Ji ber hindê jî bi rastî hevalênu ku em bikarîbin ji wan istifade bikin ku me gelek caran jî gazî wan kiriye lê mixabin nehatin. Hinek jî du-sê civînan besdar bûne û pişte nehatine.

Hevalênu ku besdarê civînê dibin devoka devera xwe zanîbin û bikarîbin di vî warî de alîkar bin. Herwîha em nuha jî li ser vê yekê disekinin ku hevalênu deveren din û devokên din zanîn peyde bikin û alîkariya me bikin.

Armanc: Ji çend deveran insan hene; yanî çend devokên Kurmancî hûn tim li ser disekinin?

R. Zilan: Di civînê de çend caran hevalênu Behdîmî û hevalênu ku ji mintiqâ Hekkarîye ne û hevalênu ku devoka Şîkakan dizanîn, hevalênu ku derheqê devoka derdora Diyârbekirê û Farqînê dizanîn besdar dibin û herweha hevalênu ku devoka Çiyayê Kurmancî û Deşta Rihayê dizanîn û hinek hevalênu ku hakîmê devoka Serhedê ne besdar dibin.

Meriv bi kurfî dikare bibêje, ku di van civînan de piraniya devokên ku li Kurdistanê hene (yek-dû ne

têde) digihîjin hev.

Armanc: Çima tenê Kurmancî? Dê baştîr nebûna ku hûn li ser zaravayê din yân Kurdi jî rawestiyana?

R. Zilan: Me gelek hewl da daku hevalênu ku bi zaravayê din dizanîn besdarî civînê me bibin, lê kesen ku di civîna Kurmancî de besdar dibin ji wan kes Soranî dizanîn.

Lê ew fedekariya ku min li jor bahskir ne tenê ji bo Kurmancî her weha ji bo Soranî jî derbas dibe. Nehatina kesen Soran ji bo civînan belkî kîmasiyeke me ye.

Lê zaravayê din wek Hewremâni, Zazakî, her çendî kîmasiyeñ me hene, lê ya me heval nedîtine yan jî wan fedekari nekirine. Lî di eslê xwe de civînê wiha ne tenê ji bo Kurmancî bûn, ger hevalênu Soran û Zaza ku amade bin û bi rîkûpêk bi hevre civînan li dar bixin û hindek pirs û pirsgirêkên zaravayê din biaxîfin, hinek çareyan derxînîn meydane yan jî dewlemdîya wan zaravayan derxin meydane, lê belê heta nuha xebateke weha nebüye. Hevalênu Soran dibêjin tiştên wilo ne pêwîst e ji ber ku ew di warê zarava Soranî de pispor in ew li Kurdistanê bi wan tiştan ve mijûl in û ji bo Soranî hinek tişt wek Kurmancî ne pêwîst e. Ji ber ku zarava Kurmancî di nav piraniya milletê Kurd de tête axafînê û zaravaya ku gelek nehatiye nivîsandin û di warê nîvi-sandinê de Kurmancî li gor Soranî gelek paşdetir e.

Armanc: Lî tu bidî ber Zazakî, Kurmancî zêdetir hatiye nivîsandîn?

R. Zilan: Vêca keysek ji nivîsandîna Kurmancî heye li Ewropayê jî û her weha li Kurdistanê jî derdikeve ku Kurmancî dinvisin û diweşinîn ji bo ku kârîbe rî li hindek sergêjiya û alozîyan bigre diviya civînê wiha bihata kînî. Ü ji aliye pêşdetira zarava Kurmancî diviyabû zû yan jî dereng xebatek bihata kînî.

Mirov dikare bêje ku ev xebata ha gelek dereng jî maye. Heta nûha keysek ne Kurdistanê û ne jî derveyî Kurdistanê peyde nedibû ku civîn çêbin. Lî ew heft sal in îmkana ku derketiye pêşîya me jî istifade dikin. Ji zaravaya Kurmancî mirov divê manayekê derxînîne, navê Kurmancî xweş na-vek e. Kurmancî di klasikan de di mana KURDÎ tê bi kar anîn.

Ku mical hebe hevalênu din jî di warênu zaravayê din de kar bikin dê gelek baş be.

Armanc: Bi giştî hûn karin bâhs bikin di Kurmancî de li ser kîjan babetan kar hatiye kînî?

R. Zilan: Zemanê ku heta nuha di van civînan de çûye piranî li ser klasikan çûye li ser klasikan xebat hatiye kînî; divê mirov klasikan temâse bike ew gencîneya peyvan di klasikan de heye genceyiya ku meriv tê de peyv û axaftina dikin ku iro hunda bûne yan jî bi zanîn jî nayen bi karanîn. Mirov wan derxîne bi awakî bêjing bike û

bikaribe têxe pêş çavê milet da ku ji wan istifade bikin.

Ya duyem xebat li ser pirsên gramatîke hatiye kînî. Hin pirsên gramatîkê bi awakî dûrûdirêj hatiye munaqesekîn û ji bo hin tiştên gramatîkê hin çare hatiye pêşniyarkîn û belavkîn.

Seyem, ji aliyê rastnivîsinê de munaqese û hinek lêkolîn hatine kînî.

Di warê hinek tiştên rojane de; wek navê heywanê nava malê de, navê aleten çandiniyê, navê alav û firaqan û tiştên din... Di warê termînolojiyê de kar hatiye kînî. Wek termonolojiya ku di rojnamavaniyê de pêwîste; termonolojiya ku di hûqûqi de pêwîste û termonolojiya gramatîkê de xebat hatiye kînî û her wiha berdewame.

Di wan civînê dawiyê de xebat li ser zimanê Pehlewî hatiye kînî. Di zimanê Pehlewî de gotinê Kurmancî ku wek Pehlewî mane û gotinê ku piçek hatine guhartîn û gotinê ku gelek hatine guhartîn û gotinê ku di zi-manê Pehlewî de hene ku jê bê istifadekîn.

Armanc: Li gor babetên ku heta nuha di van civînan de hatine munaqesekîn aliyê wan yân xurt û qels yân Kurmancî ci ne. Kurmancî di ci de xurt maye û di ci de qels e?

R. Zilan: Zarava Kurmancî di hinek waran de dewlemdend e ji bo hinek tiştan meriv kare 10-15 sînonîm derxe. Bo numûne di warê çandinî de ji bo gulekê ji bo heywanekî meriv kare 10-15 navî bêje. Di warê jiyana koçeriyê de di warê heywanxwedikîn de, di warê evîniyê de meriv kare pirsê zelal bibîne.

Lî di warê tiştên abstirak û di warê termonolojiyê de gotin dîtin gelek zahmet e. Di sedsala me de pêşdeçûna teknolojiyê gelek li pêş e; di warê cihê cihê yê teknolojiyê de, di warê zanîstî de pirs derdikevin pêşîya me ji bo wan jî termoloji pêwîst e, di wan waran de Kurmancî geleki qels e.

Armanc: Termîn ku di Kurmancî de tunene û hûn dixwazîn wê peyde bikin hûn wê ji zimanekî din yan zimanekî cîran digrin, yan jî zaravayeke din digrin yan hûn bi xwe çedîkin?

R. Zilan: Di Kurmancî de hinde term hene ku ji berê de hatine bikaranîn her çendî ku berê bi awakî zelal nehatibe bi kar anîn jî. Lî iro ew term ciyekî taybetî digre û ji bo wî meriv kare bi kar bîne. Em wan tespit dikin û belav dikin.


Ya duyem; ger termek pêwîst be ku mirov di nav gencîneya Kurmancî de nebîne, li zaravayê din dinerin, ger di wan de hebe li gor fonetiķa Kurmancî em wê dinvisin û belav dikin.

Ya sêyem ewe ku hinek term meriv kare ji peyvîn heyî biafirîne. Li gor qâide û qanûnê Kurmancî. Eger keys hebe ji bo afran-

Heppeyivîn

dina termek weha em wê wek pêşniyar qabûl dîkin ku ji aliye ke-sen ku dinivisin de ku bê qebûl kirin ew êdî tê bikar anîn. Mesela di warê gramatikê de gelek termên weha hene, di warê leşkerî de hene.

Termên ku di Kurmancî û zara-vayê Kurdî yê din de nebîn em ji çi zimanekî din wernagerînin em wisa dihêlin.



Rojnama Kurmancî: pişî her civînekê encamên wê di Kurmacîye de belav dibin. Kurmancî heta nuha 13 hejmar derketime. Hejmara wê ya 1. di Havîna 1987 an de derket.

Armancı: Hûn babetê civînan cawa hildibjîrîn û çawa di nav xwe de parve dîkin û li ser çareserkirinê cawa biryar tê sitandin.

R. Zilan: Biryar di civînen me de nahê wergirtin. Di warê parvekiri-na babetan de em di civîne de pêşniyar dîkin. Mesela li ser çandînîye hevalek dibêje ez li mintiqâ xwe karim navan berekim û bînim. Ew di Kurmancî de jî belav dibe. Lê carna pewîstiyek dertê pêş, divê pirsek bê çareserkirin di warê rast nîvîse de. Hevalek vî kari digrê ser milê xwe û tînê civînen. Carna jî ji hevalen derveyî civîne di warê tiştekî ku ew tê de pispore, em tika dîkin ew têna alîkariya me dîkin.

Armancı: Kovar û rojnameyên Kurdan di warê rastnîvisin û terman de herkes wek xwe dînivise û bi kartîne; lê Kurmancî ku hûn derdixin û tê de encamên civînen xwe çap dîkin; ew ji bo kovarîn Kurdan nebûye çavkanîyek û otorîteyek, sebebîn wê ci ne?

R. Zilan: Di warê zanistî de pişî kareke dûr û dirêj otorîte çêdibe; ew degez dibîn otorîte. Otorîte gelek caran bi hebûna dewletekî ve gire-dayî ye. Gava ku devletek tunebe li ciyeckî peydabûna otorîteye ku bi-karibe li ser axaftîn û nîvîsandina mîletekî biryare bide gelek zehmet e. Heta ku pirsa Kurdî bi awakî zelal neyê çareserkirin û Kurd nebin xwedîyê tiştekî, peydebûna otorîteye ke ku li ser jiyana Kurdî biryare bide gelek zahmet e. Vêca bi hebûna grûben siyasi yê cihê cihê û heta nuha nebûna konsesuske di navbera grubûn siyasi yê cihe cihe de bû se-beb ku her grubek di awayê nîvîsandina xwe de jî israr bike. Ev dikare bibe cûdabûn di warê gra-matikê de, bikaranîna elfabeyen cuda de û bi karanîna termolojiyên taybetî de.

Ez dibejim iro pirsa herî giran di nav Kurmancan de ev e ku hebûna grûben cihe cihe yê siyasi û di nav van grûban de heye rê dide ku ew me-cala nîvîsandina Kurmancî ya heyî jî nikare bigihêje ciyeckî. Ev astengeke pêşîya Kurmancî ye. Çendîn pispo-reñ me yê zimançan jî tê de hebin ew dibe biryareke din. Nabe biryara

otîteyekê.

Armancı: Heyemeke munaqesê di nava rojname û kovarîn Kurdi de li ser alfabe Kurdi dibe. Li ser vê Enstituya İstenbulê çend civin çekirin, di vî warî de hinek kes ci-vandin. Rojnamen Welat, Azadî, heta cihekî Armancı besdarî van muneqesan bû. Kurmancî besdarî

İca tunebûna insanen me yê akademik divê cih li ber hinek tiştan negire. Hindek tişt hene hîc pêwîst nake ku mirov xwedîyê xwendina akademik be. Gundiyekî ku zarava xwe pir bastır zane dikare ji yekî akademik bastır xizmete bide Kurmancı. Ji ber ku gencîniya gelek dewlemend pêşkesi akademisiyan bike. Xwezi çend gundiyen wiha hebûna besdarî civinê bûbûna

van munaqeseyan nebû. Gelo ma fikrek weha tuneye ku Enstituya Kurdi ya Parisê bibe piştigir ku nûneren tev enstitusyon, kovar û rojnameyan û zimançan bi-civîne, bi kêmânî bikaribin di warê alfabe û rastnîvisinê de bigihêن biryaren hevbes daku ev alozîya ku nuha heye nemîne?

R. Zilan: Ez naxwazim pesnê bidim ica dimîne li ser teqdîra we, li ser teqdîra hevalen din. Lê ew munaqeseyen li İstenbulê bûbûn, rastî haya min jê nebû. Her çend hatibû nîvisandin ku ez jî hatibum dawetkirin ji bo tiştekî wusa bû û bawerîyen min di hin waran de hatibû pirsîn. Ez bi xwe jê xeberdar nebûbûm tu cara tiştek wisa negi-hisîye min. Kurmancî jî bi awakî resmî û ne resmî jî nehatiye gazikirin, bi awakî nehatiye xeber-darkirin egerbihata xeberdarkirin, eger peşniyarek wiha bihata bê gu-man me yê jî fikrek bigota. Lê mixabin tiştek wiha nehat.

Ji bo komkirina kovar û rojnameyên Kurdan di warê rastnîvisin û terman de herkes wek xwe dînivise û bi kartîne; lê Kurmancî ku hûn derdixin û tê de encamên civînen xwe çap dîkin; ew ji bo kovarîn Kurdan nebûye çavkanîyek û otorîteyek, sebebîn wê ci ne?

Armancı: Wek tê zanîn heta hejmara 11. redoktorê Kurmancı Mehmet Uzun bû li pişte ev hat

Kesên ku kart û piroznameyên ser salê ji me re şandine

Recep Maraşlı -Ji hefsa Sagmacılar-Stenbol-Turkiye, Ahmed -Sûriyê, Mustafa Aydogan- Stockholm, li ser navê komek xwendevanen
Armancı Mehmet Er-Almanya, S. Roşan-Swêd, Partiya Sosyaldemokrat a Swêde liqê Stockholmê, Seyda, Ozlem, Baran û Faysal-İngilistan, Rojen Xerzî-Fransa, Rojnama Medya Gunesi-Stenbol-Turkiye, Hevkar-Almanya, Halim Can-Swêd, Çeto Omeri-Swêd, Yorgo Bacaya-Yunanistan, Akiko Yamada-Japonya.
Gelek Spas.
Redaksiyona Armancı

guhertin tu bûyi redektorê wê. Sebebî guhertinê çibû?

R. Zilan: M.Uzun heta hej-mara 13 an berpirsê Kurmancî bû: Vî hevalî jî mej ve pişti ku dev ji berpirsîyariya kovara Hêvî jî berda xwst dev ji berpirsîyariya Kurmancî jî berde. Berpirsîyariya Kurmancî girêdayî berpirsîyariya Hêvî

bû vêca dû civin berê ev guhertin çibû.

Armancı: Di çerçewa Swedê de dibejim di raya gişîya Kurdî de gumanek li ser besdarbûna kesen ku besdarî civinê dîbin heye. Xwendinek akademik, mustaway-eke akademikî ya wan hevalan tuneye. Her kes dikare besdarî civinêne we bibe. Yanî her kurmancıaxêvêk dikare besdarî civinê bibe, tu li ser vê yekî ci dibejî.

R. Zilan: Ewa rastîyekî ku di nav Kurdan de kesen bi awayê akademik xwendî û xwedîyê zan-yarîyek li ser pirsên cihe cihe yê zaraveyên kurdi nîne yan jî gelek kêm in. Ji Kurdan 3 kesen akademik hene yan tunene. Ev tiştek eskere ye.

İca tunebûna insanen me yê akademik divê cih li ber hinek tiştan negire. Hindek tişt hene hîc pêwîst nake ku mirov xwedîyê xwendina akademik be. Gundiyekî ku zarava xwe pir bastır zane dikare ji yekî akademik bastır xizmete bide Kurmancı. Ji ber ku dikare gencîneyek gelek dewlemend pêşkesi akademisiyan bike. Xwezi çend gundiyen wiha hebûna û besdarî civinê bûbûna.

Ew aliyekî pirsê ye aliyekî din çend hevalen me li Ewropayê hene bi taybetî di warê zarava Kurmancî de xwendine, bûne doktorê beşen xwe. Lê mixabin ew nayen civinê yan jî carekê têne û dev jê ber didin. Vêca insanen me neyen civinêne fedekariyê nekin dê rewş wê her weha be.

MEDYA-MAHABAD BUROYA MUHASEBÊ

- *Muhaseba şirketi
- * Muhaseba momse
- *Bilançoya dawîya salê
- * Analiza bilanço
- *Beyanname
- * Karênc bacê (vergi)
- * Damezrandina şirketan
- * Şewirdanî

Em bi Kurdî, Tirkî û Swêdî dipeyivîn

Navnisan:
Polhemsgatan 18, nb
113 36 STOCKHOLM

Tel (faks) 08-654 40 31

Jİ GERNAMEYA MARCO POLO 8 Li Asyayê

Wergér ji Swêdis Mihemed Behsiwar

Di nav dewaran de hinek heywan hene ku gelek cuda ne. Li virê şiklek gayê sipî heye ku bê pirç e (sebu) û sebebî wê jî germahîya hê-wayê ye. Qloçen wan kin, qalind û ko ne; di navmilên wan de qambûrek heye û wek firehiya du destan bilind e. Ew ji ber ku kare ba-rên giran hilde, pir bi qimet e. Çaxê ku meriv dixwaze bar li wan bike, hingê ew weke deveyan çok dide û pişte ew bi xwe tevî barê xwe ra-dibe ser lingên xwe. Her wiha meriv kare li vir mihîn wek keran me-zin jî peyda bike. Dûvîn wan qalind û dirêj in ku ji 15 kiloyan girantir in û donê wan pir bi tam in. (mêşina dûvqelew) Li vî welaflî gelek ba-jar hene ku dora wan bi diwarêni ji axê çêkiri û bilindkirî hatine girtin da ku gelê bajêr xwe li hember êrişen Karauna (43) bi parêzin -ku ew vi welaflî wek lehiyê talan dîkin û ci dikeve pêşîya wan paqijdikin.

Ji bo ku xwendevan bizanibin ku ev ci xelq e, giring e meriv bêje ku mîrek bi navê Nugodar (44) ku braziyê Zagatai (Çaxatay), birayê xanê mezin Oktay ku li ser Turkistanê hukim dikir hebû. Ev Nugodar ku li seraya Çaxatay di jiya, bi ihtîrasek mezin dixwest xwe bîne ser hukim. Çaxê ew pê hisîya ku welatek bi navê Malabar (45) li Hindê heye, ku hingê ji aliyê qralekî bi navê As-îdin Sultan (Sultan Ezedîn) (46) di hate idarekîn û hîn jî ne di bin hukmî Tataran de bû, ewi rabû bi dizî deh hezar leşkerê hov û bê tirs da hev. Ew tiştek ji van planen xwe ji apê xwe re ne goi û jê qetîya û bi rê ket. Tevî leşkerê xwe di riya Balasjan (Badaksjan) (47), di nav qraliyeta Kaşmîr de çû ku li wir ji ber zorî û nexweşîya rîyan gelek serbaz û heywanen xwe winda kir; lê disa ji xwe gîhiştand welatê Malabar. Hingê ewi Sultan Ezedîn xapand û da şaskirin û bajarê Dely (Delhi) û çend heb cihîn din jî xiste destê xwe û li wir dest bi hukim kir.

Tatarênu ku ewi wan bire wirê laşe wan sipî (yan jî zerê vekirî) bûn. Ewana jînên Hindê yên bi reşî ve ji xwe re anîn û zarûkên wan bûn texlîdeki din û tevlîhev. Ji vê azabatê re jî navê Karaunas hat danîn ku bi zimanê xelqê wir dihat maneya 'xelqê tevlîhev'; ew xelqê ku ji vê demê pê ve karê şêlandinê ne bi tenê li welatê Reobarlê, her wiha li her cihîn ku ji wan re xweş bûn dikirin... Li Hindê xwe fêri senetê sêrbazî û karê seytanîyê kîrin; û bi alîkarîya wê karibûn tarîfiyê jî pêk bianîna. Ronahîyê wisa tarî dikirin ku kesen li cem hev rûnişî jî nikaribûn êkdu bidîtina. Hingê wan qefila xwe ya dizan zû derdixistin ku dema ew têkevin nav gel kes bi wan nehisîya. Wextê tacir li Hurmizê dicivin û lihîviyâ yên ku ji Hindê hespên xwe û qantirêne xwe di zivistanê de dişinîn rasta Reobarlê ku li virê ji ber êm û merayen zengîn qelew di bin, hingê ev mintiqe gelek caran dibe cihê leystika wan, ê bê qanûniyê û xerabiyê. Berî ku ew dest bi karê şêlandineke mezin bikin, kêm caran ew bi vê dihisîyan. Zilamên ku bi heywanan re diçûn ger diravan nedanâna wan, dibûn kole. Marco Polo carek bi xwe jî wisa di tarîfiyeke sêrkirî de hat girtin (48), lê ew ji vê rizgar bû û çû Koşka Konsalmî. (49) Çend hevalen wî yê rîwingîfiyê hatin girtin û firotin û hinek jî di bin şûre dijimin de hatin qetikirin.

Çaxê ku meriv di wê rasta ku di jor de hat baskirin û ku ji aliyê bakur ve pênc rojan dîkşîne de diçe, meriv digije berjoreke ku 20 mîl dîkşîne. Ji ber ku diz û esat timî bi ser rîwingîyan ve digirtin û malen wan ji distandin, ew der pir talûke û xeter e. Ew berjor digije rasteke ku berbiçav dîtina wir pir xwes e. Ew zêdeyî du rojan domdike û jê re Rasta Hurmiz tê gotin. Li virê meriv di ser çem û avên piçûk de derbasidibe û heremeke tişjî ji darên xurmeyan dibine. Meriv di nav daran de civîkên wek tûfî û gelekîn din ku ji hêwa welatê me re xerîbin dibine. Ü dawîyê meriv tê ber qeraxê Oqyanûsê. Li ser giravékê nêzî qeraxê deriyâye bajêrek bi navê Hurmiz (50) heye ku ji der dora Hindê gelek bazirgan tene wirê û ji virê tişten xwarinê, kevirê bi qimet, mircan, zêr, cawê ji hevrîsim, diranen filan û gelek tişten din dibin. Ev ji aliyê bazirganen curbecur tene kirin û diçin çar aliyê dinê. Ev bajêr ji awayen bûyeren xwe, bi quđret xwanê kirina xwe û bi girêdanîya bajêr û qesrên xwe ve wek serokbajarê qraliyeta Kermanê tê naskirinê. Navê hukimdarî niha Rukmedin Achomak (51) e, hikmê wî bê sinor in lê disa ji qalî Kermanê wek serokê xwe dibine. Dema tacirekî xerîb li wir bimre, hukimdar malê wî dixe nav xizna xwe.

Têbini

43) Karaunas xelqekî ji Moxolan e. Pişti êrişen ser Iranê, ew li wirê bi cih bûn û bi şêlandin û xerabiyen xwe dihatin nasîn.

44) Bi navê Karaunas re gelek caran navê Nîgûdarîs jî tê ser ziman ku bi eslê xwe ew leşkerê nebîyê Çaxatay, Nugûdar bûn. Li gorî ji nîvisen Marco Polo tê famkirinê, ji vî navî du kes hebûne.

45) Li gorî dîrokzanan Malabar ji bo Lahawar tê gotin ku iro navê wirê Lahore ye û li Hindistanê dikeve.

46) Ew As-îdinê ku Marco Polo basdike, Ghiasuddîn Balbar e ku di nav salen 1265 û 1286 an de li ser Punjabê hukim dikir.

47) Bedexsan dikeve başûrê Afganîstanê.

48) Ev bûyeren ecêb ku di jor de têne ziman li çolên Xoresanê çedîbin. Şêlandinê ku di vê heremeke de çedîbin di demen rabûna ba û bahozê de, dema ku çav çavan nediditîn çedîbûn.

49) Konsalmî ji navê Kanat-ul-Sham tê û li ser rîya Marco Polo diket.

50) Ew bajêr kevn Hurmiz ku tê baskirin li nav deşte diket û bi texmîni di sala 1300 an de hat barkirin û çû giravékê, nêzî Delava Iranê.

51) Rukneddin Ahmed (1242-77)

Çand û wêje

Hey qeda Xwedê bi te keve!

Dr. Misto Masto

Vê carê dê wext ne destê sibê be; çinkî em bi xwe, em dê cih û demê destnîşan bikin ne tu Misto Masto!!

Tu dixwazî jiyanâ me yî edebî û jiyanâ nivîskarên me yîn ku destpêkirine û edebiyata me ber bi qonaxa "modernizmê" de diguhêzin; tevlîhev bikî, ne? Lewra em li beramberî te rawestaneke tund dipejirîn; digel ku te çend serçavk ji ser rûyê çend kesan hilaniye jî... Anuha pêwîst e ku tu jî rûyê xwe li beramberî xwendevanen eşkere bikî: xwendevanen Armancê yîn ku ji te we ye ku tu bi navê wan dipeyivî!

De birako de! de ka em rûyê te yê rastîn bibînin, an tu jî wek ên ditir tu yê xwe bi serçavkan veşîri?

De wer! De ligel hemî çekêne xwe yîn ku tu carî em jî wan netirsiyane û natirsin jî wer vê çapvêketin...

- Xêr e, tu dixwazî bi vê pêşgotina xwe min jî dest hilanîn bixinî?

= Dev ji me û ji peyva "Xêr e" berde. Çinkî ji wê rojê de; roja ku tu di jiyanâ me de peyda bûyî me tu xêr nedîtiye. Piştre gerek tu ji bîr nekî ku em dê pirsan ji te bikin ne tu...

- Hergav ez di bin xizmeta we de me!

= Misto Masto pêwîst nake tu xwe di paş van peyvîn "Dikandaraene" de veşîri... Bawer bike tuyê nikarîbî me bi vî zara-vayî bixapînî! De îca, wek ku mirov di liskek paqîj debe, hemî kaxêzên xwe eşkere bike çêtir e.

- Ez bi xwe ji bili "DAMA" bi tu liskeke ditir nizanim, ez bawer im ku liskeke paqîj e... Hemî zilamîn taxê dikarin bibin sahîdîn min ku min di vê lîskê de fen û xap nekirine. Lî ez dixwazim sedemîn ku tu ji min tore bûyî bizanibim; ma gelo çîrok şexsî ye yan jî gişî ye?

= Her du bi hev re ne!

- È de ka em bi ya pêşîn dest pê bikin. Ma min gi ziyan gîhandiye te? De wer rûnê çêtir e ku cîranê me yîn "dikandar" wa guman bikin ku em pev diçin!

= Ji xwe ez hatime pevçûnê, lê baş e va eze rûnê, emrê min ji Xwedê Re Misto Masto!

- È....?

= Qeda Xwedê bi te keve!!!

- Seheta te xwes, piştî?

= Di nivîsa xwe ya bi navê "Gerdûnîst" de te ez wek "Meyfiroş" pêşkêşî xwendevanen kiribûm..

- Rast e! Erê birako ma qey tu "Zembîfiroş" i?

= Ne Meyfiroş û ne jî Zembîfiroş im. Xelkên taxê tev dizanîn ku anuha ji ber "betaliyeke mezin" bûme heval û allkarê "Circisê" meyfiroş!

- Madam wisa ye ez lêbûrînê ji te dixwazim, de ka ez maçî biriqandina serê te bikim!!

= Erê birako ci fêdeye ku dilê

min paqîj e. Lî mesela diwemîn a "gişî" mîna ku tu wê bi nav dîkî ev e: Tu radîbî çapvêketinêku li ser piyan di nav me de çebûbû di rojnameyeke resmî de belav dîkî. Erê bas e, te ji min re negot, ne xem e. Lî sedemîn ku tu wê di nav xelkê de belav dîkî ci ne??

- Tu jî bo ci tote dibî hey rehme li bav, madam min bi xwe ew çapvêkeftin bi durusî û bi destpakî belavkiriye. Di baweriya min de gerek ne tu û ne xwendevan û ne jî "dahênerên nûjen" tote bibin... Çinkî min bi xwe rastî gotiye, min rastî parsastiye, lê eger gotin û parastina rastiyê "Qaçax" be, îca tiştekî din e?

- Lî gerek tu rastiyek din jî bîzanibî. Anuha tu ketiyî "Xaneya" WANTED de!!

- Ev ci ye Elîko, ev navê xwarinek sivik wek serûpê ye?

= Na misto, peyvek Îngilîziye, yanî serê te yê weşyayı têt xwestin!!

- Bi rastî tiştekî seyr e, dêmek belavkîrina nivîsekî bûye tawanbarî ne? Hetanî vê derecê rastgoyî di cîvaka me de bêxwedî maye? na Elîko na, tu carî nivîsîn min nabîn wek Qaçaxiyê, wek Kassa res û dîziya 40 pirtûk û gotarekê "Elî baba" û berhevkîrina wan di romaneke de ku ew roman bi xwe dê bibe stûna damezirandina romana Kurdi!(?)

= Tu rastiyê dixwazî Misto! F. Cewerî dibêje ku tu bê edebî!

- Rast e keko, ma ne min di şes saliya xwe de "Quran" xitim nekiriye. Îca ezê ji kuderê hînî edebî bibim... Min bi xwe edeb û edebiyat jî ji wî re û ji şîrkîn wî yîn nûjen re hiştine!! ma qey tu dixwazî ku ji min re bêjin. Destê te sax be her bijî!!

= Erê û tiştekî din jî.. Di Armancê de nivîseke nû derketiye, ma xwene işkekî bi serê te dike. Nivîsarê vê nivîsa balkêş a ku tu carî tu bi zimanîn wisa kûr û dûr nehatiye nivîsandin; Suleyman Demir e!

- Ji ekola Nûdemê, ne?

= Ez nizanim lê ji nivîsa wî dixuye ku ew jî nûjen e.

- Dêmek nêçîra di ava sêlû de dê berdewam bike Elîko! Tu wî dinasî?

= Ma nayê bîra te ku beriya nuha helbesteke Mayakovski di Nûdemê de ji Tirkî wegerandibû, ne helbest mabû helbest û ne jî Mayakovski mabû Mayakovski. Minbihîstiye ku xwe amade dike da ku şûna "dahênerên" me di PENê de û di Kulturrâdetî de bigre.

- Wey Maşallah!!

= Xuya ye ku tu dixwazî vejerî bê edebiyê xwe!! Zilam dipirse; pişti pêşgotinekî ku ne R. Part û ne jî Rene Wellek wekî wê nivîsandine, dipirse ma gelo tu nivîskar an doktor an rexnegirî?

- Ma ne ku S. Demir jêhatî be, gerek vê pirsê ji Dr. Poloço bike ne ji min!

= Ü dibêje "ger nivîseke wilo, bi navekî erzan ku tu mirov bi xwestina dilê xwe li xwe nake derkeve, hin sedemîn ku mirov baweriye bîne hindiktir dibin û him jî şîkê dibe ser hinekîn din"

- Eferî!! Dêmek navê me yê rastîn bi xwestina dilen me ne!! Dêmek eger navê min Mustafa Demirel bûya dê navekî giranbûha û cihê serbilindahiyê bûya dê xwendevan pêtir bawerî bi nivîsîn min bianîna, ne? Tu dizanî Elîko û dîrokê de nebaşîrîn nivîskar kî ne?

= Yênu ku derewan dîkin?

- Na, gelek caran di nivîsandinê de derew dibin pile û palpîst da ku nivîsandin bigihêja kakila rastiyê. Lî nivîskarê nebas ew e yê ku ber bi rastiyê de neçe, wê nebêje, wê nerîvîsîne argo yê ku bahanan ji çewtiyan re bibîne û bergiriya çewtiyan re bibîne û bergiriya çewtiyan re bibîne û bergiriya çewtiyan re bibîne û bergiriya çewtiyan re bibîne û bergiriya

= Hêdî hêdî birako! ka ez ji te re temam bikim "di baweriya min de tirsonekiyek di pişt wî navî de heye"

- Elîko! Kuro law ev peyv peyvén F. Cewerî ne. Ji sibehê hetanî nîvê sevê, ci bi dev û ci bi telefonan ji dosten xwe re wilo dibêje. Ma dikeve serê te ku wî û S. Demir bi hevdû re nivîsandibin yan jî F. Cewerî jê re nivîsandibe?

= Ez nizanim lê bi, rastî pêşgotina wî dide xuyanî kirin ku bîraderê me hema çend pirtûk ji xwe re xwendine û xwestiye li ser hesabê te navekî bi xwe xîne. Çinkî Misto! Tu tişti ne li ser dîroka rexneyê ne jî li ser teorî û babetên edebî, dizane. Ji xwe li ser pêşveçûnê dipeyive. Mane gerek herkes bikaribe di navbera du pêşveçûn de cihêbûnê bibîne, mane pêşveçûn di hemî waran de, ne tenê, yek pêşveçûn e, mane pêşveçûn wek raman, di çarçewa xwe ya teorî de di sedsala 18' an de derketiye lawo!

- Dêmek gerek mirov wî pîroz bike.

Te go "tirsonekiyek di pişt wî navî de heye" ne?

Ez bi xwe eşkere dibêjim; û li ber hemî xwendevanen Armancê: Misto

Masto dê xwe bi navê xwe yî Kurdi û resen ta roja qiyametê, serbilind bike. Ma ez û ji ci bitirsim? Ji pênuşa bedew a M. Uzun an ji şehîn ku li karxana MAX-FACTORE hatine çêkirin? Ez bi xwe bawer im û pişta min ji min rast e!! Hemî tiştiñ ku min di "Gerdûnîst" û "Dr. Poloço" de nivîsandine, dê bibin milkê dîrokê. Armanca min ne ew e ku S. Demir van çewtiyan bizanibe, lê da ku xelkên Kurd pişti 50 salî, dema ku Armancê bixwînîn, bikarîbin dîmenê vê qonaxê nas bîkin! Anglo dîroka xwe ya dawiya sedsala 20'an bizanibin!!!!

Da ku bîzanibin ku xwedî û berpirsyarê gişî yê xwesiktirin kovara edebî, helbesta "Azadî" ya "Paul Elward" ne xwendiyê û ne jî dikare wê ji helbesteke D. Ferhî cihê bike..

Da ku bîzanibin ku nivîskarên modernizma zimanê Kurdi bi dîziyê destpêkirine; diziya ji pirtûkên ronakbirin Kurd, diziya ji filmîan, ji behemên nivîskarên herêmê û yê Ewrûpayê!!

Da ku bîzanibin wek ku, çawan bi navê Kurd û Kurdistanê (ne ji bo Kurd û Kurdistan) milete Kurd dihat kustîn û qirkirin; wisa jî, bi navê pêşvebirina zimanê Kurdi (ne ji bo !!!) sextekarî dizî, derew, xwe gîhandin, cambazi û bazarîn dihatin kirin!!

- Tu bi rastî dixwazî S. Demir rexnegirekî mezîn e. Di baweriya min de wî jî daye ser reça hevalê xwe yê "pesintiji". Çinkî di nivîsa wî de nêzî 50 û peyvîn latînî cih girtine; bi taybetî peyva "komedyâ" ma tu (me'na) wê dizanî?

- Ez bawer im ji Kurdi hatiye: Kewê - Medya!!!

= Reng e! lê Misto tu xwe bi navê xwe paye dîki ne? lê, çawan mirovki mastfiroş dikare wisa li ser çand û edebiyatê bipeyive?

- Ez bi xwe jî ji te dixwazim ku tu vê pirsê ji Dr. Poloço bikî; ê ku di kurtujevana xwe de dibêje ku ez Dikandar im. (Nûdem 4, rûpel 93, Xêza dawî).

Piştre ez bi xwe li ser edebiyatê nepeyivîme, tişta ku min kîriye min hewl daye ku ji hundir ve wan ronî bikim, anglo li ser gend gîrekîn war yê psîkolojî bipeyivim da ku xwe binasin. Lî çinkî hayê S. Demir ji rexnegiriya psîkolojî nine -wek ku ez bawer dikim-mechûr maye û çend peyvîn qelew ji xwe re ji vir û ji wir peyda bike!!

= Ma ê ku li Swêdê dikandariyê bide xuyanî kirin. Çinkî ew bi xwe jî ji E. Huseynî ne razî ye!

- Nerazîbûna wî ji ber ci ye Misto Masto?

- Nerazîbûna wî ezbenî, ji bo ku bê gotin gerek Mayakovski ji gorê rabe!!

- Lî S. Demir di nivîsa xwe de nefspîcûk dixuye. Wer temaşa bik bê çawan li ser rewşa çanda Kurdî digirî, çunkî li Kurdistanâ Bakur anuha dest pê kiriye, lewra gerek ên wek Jack LONDON dernekevin!

- Lî ez mîzgîniyek pir mezîn didim, rexnegirê me, ku wa yê mîna M. Stokholm di çanda Kurdi de peyda bûne. Ma qey nivîsa X. Dihokî ya li ser wî nexwendîye; ku çawan wî dike G. G. Marckiz!!! Ma qey pêşgotina F. Cewerî ya ku wî dike wek Focner nexwendîye?

- De lo hê piçûk in malava S. Demir di nivîsa xwe de wilo dibêje!

- Ma ne gava ku Y. Guney. Y. Kemal û S. Berekat baştırin berhemên xwe nivîsandibûn, ji wan piçûktir bûn lo!! Ma kînga di dîroka edebiyatê de, temen bûye pîvana efirandin û dahênanê???

- Lî Misto, ma tu ji ber berhemên wan nivîskarên Kurd yê ku bi zimanê biyanî nivîsandine şerm nakî?

- Gerek ne ez şerm bikim Elîko, gerek ên sextekar ku, ne-nivîskariya xwe û têkçûnên xwe û tunebûna behreya nivîsandinê li cem xwe dixin hustuyê zimanê me yê zelat û resen, şerm bikin! Ma tu dizanî ferq di navbera wan de ci ye?

= Na!

200!!" xwendevanen xwe re nabêjin ku, Misto Masto ne rast dibêje? Piştre, madem S. Demir di zane ku bîriqandina serî tiştekî biyojolîk e, ma çima kerem nekir û ji X. Dihokî bi xwe re negot." Birayê hêja pêwîst nake ku tu serê xwe binuxumînî! "Ê ku bixwaze dikare li hejmarê Nûdemê temase bike".

= Ligel vê jî, rexnegirê mezîn dibêje ku Misto Masto "ne xwendiyê tu edaletê ye". Çima li ser hevdûpesinandina Bavê Nazê û E. Huseynî nepeyiviye?

- S. Demir rast dibêje!! Çunkî eger B. Nazê jî li ser şexsê E. Huseynî bipeyiviya dê birader ne wek "hevdûpesinandin" ê le temase bikira!!

Bavê Nazê naveroka pirtûkê dipesinîne û F. Cewerî M. Uzun dipesinîne û di pêşgotina pirtûkê de yek peyvî (!!) li ser naveroka pirtûkê napeyive!

= İca çima qala Bavê Nazê ki riye !!

- Bîna xwe fire bik, ezê ji te re bêjîm! S. Demir jî wek F. Cewerî û M. Uzun û çend kesen ditir "ên ku xwe biçirînin jî dê nebin nivîskar" şîkê dibe ser E. Huseynî!

= È ma qey şîweyê E. Huseynî di nivîsandinê de, nexwendine?

- Ma ne jixwe vêya ez tegandime loo! Lewra ez dibêjîm, gerek tu kes min gunabar neke! eger bi rastî nivîskar û dahêner û nûjenvan û berpirsiyar û rojnamevan bûna gerek di cih de tê bigîstina ku ev şêwe ne şîweyê E. Huseynî ye û ne jî E. Huseynî dikare bi vî awayî binivîsine!

= İca S. Demir jî xwestiye vêya bide xuyanî kirin. Çunkî ew bi xwe jî ji E. Huseynî ne razî ye!

- Nerazîbûna wî ji ber ci ye Misto Masto?

- Nerazîbûna wî ezbenî, ji bo ku bê gotin gerek Mayakovski ji gorê rabe!!

- Lî S. Demir di nivîsa xwe de nefspîcûk dixuye. Wer temaşa bik bê çawan li ser rewşa çanda Kurdî digirî, çunkî li Kurdistanâ Bakur anuha dest pê kiriye, lewra gerek ên wek Jack LONDON dernekevin!

Di sala 1920'an de Parlamento ya Brîtnya Mezin bîryara dubeskirina û İrlandayê da; İrlandaya Bakur û Dewleta Azad a İrlandî. Dubeskirina û İrlandayê di sala 1921'an de bi peymanekê ji ali herdu dewletan hat qebûlkirin. Peyman di meha Çileya Pêşîn a sala 1921'an de hat imzekirin. Ev peyman bû sedemê şerê sivil. Çiroka li jêr bûyerek ji vî şerê birakuijîye ye. Me ev çirok ji Ingilizî wergerand Kurdi.

Navî orjinal: The Sniper
Niviskar: Liam O'Flaherty
Wergêr: Hesen Mizgin

Nışangir

Evara dirêj a meha Tîrmehê bi şevê wenda bû. Bajare Dublîn ket nava tarîtiyê; tenê tîrê-jen lawaz ên xemgîn yên heyya cil-misî ji navbera ewrênen tenik kola-nen bajêr û tariya River Liffey rohîn dikirin. Li çarmedora Four Lourtsê ku li wê derê şer bê rawestan dom dikir, teqîna çekênen giran bû. Li vir û li wir, li nav bajêr tiving û debançeyen otomotik weke ûra-ûra kuçikên gund bêden-giya bajêr xera dikirin. İralandîyan li dij İralandîyan şer dikirin; şerê sivilan.

Nışangirekî Repûblikan (komarxwaz) li nêzî Pira O'Conell li ser banî dirêjkirî temaşe dikir. Li tenîşa wî tivinga wî dirêjkirî bû û dûrbînek di stûyê wî de bû. Rûyê wî wek yê xwendevanekî zefî û ji bo qurbaniyê amede bû lê belê çavên wî bi awirênen sar ên fa-nâzîmê dibiriqin. Awirênen wî kûr û xemgîn bûn, çavên wî weke yên yekî ku fêrî dîtina miriya bûbe, xwiya dikirin.

Sandawîça di destê xwe de wek gurekî birçî dixwar. Ji şeveqê ve tu tişt nexwaribû. Heyecana wî nehiştibû ku pariyek nan bixwe. Sandawîça xwe xwar û viskiya di berika xwe de derxist û bi leza qu-ret vexwar. Pişte şûşa viskiyê xiste berika xwe. Hinek bîhna xwe da û li ser rîska kîşandîna cixarekî fikirî. Cixare kîşandîna pir bi xeter bû. Îhtîmala dîtina alava kîfrîtê ji ali dijminen li wî aliye din mezin bû. Biryara xwe da ku cixareke bikşîne. Cixarek xiste navbera lîvîn xwe, kîfrît

pêxist, bi lez du-sê hulm kîşandin û cixara xwe veşart.

Hema ji nişka ve berikek gule li koşika wî ket û serê kozikê dûz kir. Nışangir careka din cixara xwe bir nav lîvîn xwe û hilmek jê kîşand û cixara xwe veşart û pişte bi dengekî nîzm çêr kir û xwe ber bi aliye çepê ve kîşand.

Nışangir bi tedbir xwe hilda û ji ser kozikê li wî alî nîrî. Li aliye din ronahiyek hebû ji nişkê ve berikek di ser serî wî re derbas bû. Bi lez xwe kîşand bin kozikê. Ronahiyê dîtibû. Ronahî ji alî din yê kolana li hember wî di-hat. Xwe ji kozika xwe ber bi bixîriyê gundir kir û bi hêdîka di pişt bixîriyê xwe rast kir heya ku bikaribe aliye din bibîne. Ji wî aliye din jîbil xetîn pîr zeif ên xaniyê li hember tu tişt xuya nedikir. Dijmin xwe veşartibû.

Pişte demekî tanqek kat û ji pişt derbas bû û hêdîka bi rê de çû. Tanq pişti nêzî 50 mêtro li wî aliye rê sekinî. Nışangir denge motorê weke ku heywanek nefesa xwe bide û bistîne dîbîhîst. Dilê wî bi lezîr lêdixist. Tanq a dijmin bû. Wî xwest ku biteqîne lê dizani ku bê feyde ye. Gulle-yen wî dê nikaribûn ji metala panzerê derbas bibin.

Ji quncikê kuçê li tenîşa rî pîrejînker derket. şaleke kevn li serî wê bû. Pîrejin dest pê kir û bi mirovî di kabîna tanqê de peyîvî. Wê bi destê xwe ciyê ku nışangir lê bû nîşan dikir. Ew müxbîr bû.

Kabîna tanqê vebû. Ser û gi-rimîlê yekî xuya kir û berê xwe da aliye nışangir. Nışangir tifin-

ga xwe rakir û teqand. Serê mirovî li kabîna tanqê bi giranî kete tenîşa kabînê. Jînikê berê xwe da kuça jê hatibû û bazda. Nışangir carek din teqand. Pîrejin li ser aliye kîzîrî û bi qêrînek kûr ket tenîşat rî.

Hema ji nişka ve ji baniyê xanîyê li hember bû qîjîna berikan û nışangir çêr kir û tifinga wî ji destê wî ket. Tifing bi ketina xwe dengek wîsa derxist ku te digot qey wî miriya ji xewê rake. Nışangir xwe ber bi tifingê te-wand ku wê hilde. Lê qewet pê re nemabû ku tifinga xwe hilde. Can di zenda wî de nemabû. Wî bi dengekî nîzm got, "Ya Isa, ez birîndar bûm".

Nışangir xwe li ser banî dirêj kir û berê xwe da bixîriyê. Bi destê xwe yê çepê zenda xwe ya ras-tê girt. Xwîn ji huçikê sakoyê hat xwarê. Tu tişt hîs nedikir lê tenê weke ku hatibe jêkirinê, milê xwe mirî hîs dikir.

Hema bi lez ji berika xwe kîrika xwe derxist û huçikê sakoyê birî. Berika dijmin di zenda wî de quelek vekiribû. Aliye din ê zenda wî qul nebûbû. Berik di hesî de çikiyabû. Hesî divê şikiyabe. Bi destê çepê milê xwe yê ras-tê ra-kir, lê mil çardin çû ciyê xwe ji ber êsa kûr diranen xwe şîdand.

Pişte, paketa ku tê de tiştîn tenduristîyê hebûn derxist û bi kîrika xwe vekir. Seriya şûşa şyodê(tendurdiyot) sikand û dilop bi dilop rijand ser birîna xwe. Hemû laşê wî ji ber êsa kûr le-rizî. Pambû danî ser birîna xwe û bi potikekî girêda.

Pişte xwe li pişt bixîriyê dirêj kir, çavên xwe girtin, hewl da bi-

karibe li dij êsa xwe raweste.

Di kolana di bin de bêdengiyek hebû. Panzara leşkerî bi lez derbas bûbû wî aliye pirê. Di tenîşa kabîna tanqê de yekî bêcan dirêjkiribû. Laşê mirî yê jînikê hê jî li tenîşa rî dirêjkiribû.

Nışangir demek dirêj li ciyê xwe dirêjkirî, birîna li milê xwe derman kir û plana revê çêkir. Şeveqê nedibû ku li ser banî wiha brîndar bihata ditîn. Dijminê li baniya hember wî ji bo reva wî bendek bû. Divê vî dijminê xwe bikuje û nedibû ku tifinga xwe bi kar bîne. Ji bo kuştina dijmin tenê debançeyeke wî hebû. Pişte li ser planekî fikirî.

Şewqa xwe derxist û danî ser lûla tifinga xwe. Pişte tifinga xwe heya ku şewqa wî ji aliye din bête dîtin ji pişt bixîriyê bilind kir. Di wê demê de dengê teqîmekê hat û berikek ji orta şewqa nışangir derbas bû û çû. Nışangir tifinga xwe bilind kir û ber bi jêr kir. Şewqa wî kete jêr ser rî. Pişte di destê xwe yê çepê ji orta tifinga xwe girt û milê xwe ji aliye din yê bixîriyê berda jêr weke ku bêcan be. Pişti demeke kurt tifinga xwe berda û hişt ku tifing bike erdê. Pişte milê xwe kîşand û li pişt bixîriyê rûnişt.

Bi lez xwe bi alî çepê ve kaş kir, li quncikê baniya li hemberê xwe nîrî. Deka wî bi ser ketibû. Nışangirê din bi dîtina ketina şewqe û tifingê wiha femkiribû ku mirovî xwe kuştîye. Niha li pişt bixîriyê rawesta bû û serê wî xweş xuya dikir.

Nışangirê cümhuriyetxwaz ke-niya û debanca xwe bilind kir û ji koziya bixîriyê derxist. Navbeyna wan nêzî 50 metro bû. Berê debanca xwe da dijminê xwe Eşêke giran milê wî yê rastî girtibû. Destê wî ji şayiyê dilerizî. Lîvîn xwe gîhand hevûdû û ji bêvila xwe nefesek kûr kîşand, nışan girt û teqand. Ji dengê debancê hema hema kerr bûbû û ji pîncika debancê milê wî dilerizî.

Pişte, dema kû dûmans wenda bû, bi awakî balkeşî li wî aliye nîrî û ji zewqa qêrînek kir. Derb li dijminê wî ketibû. Di nav êsa mirinê de nışangir ji zewqa xwe li wî alî û li wî aliye gundir dikir. Hewl da xwe ku rabe ser piya lê hêdîka ber bi pêsiya xwe

weke ku di xewnan de be, ket.

Piştre dijminê di ber mirinê de li ser baniya li hember duqat bû û ber b pêş ve ket. Laşê wî li ser banî ber bi jêr ve gundir bû û kete ser rî. Ü li ciyê xwe bêdeng ma.

Nışangir li dijminê xwe nîrî û ji nişka ve lerizî. Viyana ser a dilê nışangir di dilê wî de mir. Viyana ser ciyê xwe da xem-gîniyê. Rûyê wî bi dilopên piçûk ên xwêdanê tije bû.

Ji ber rojæ dirêj a havînê, birîn û birçibûna xwe qels bûbû. Dema ber bi dijminê xwe yê mirî nîrî ji kirina xwe kete poşmaniyeke kûr. Qırçînî ket diranen wî. Xwe bi xwe dest bi çêran kir, lanet li şerî anî, lanet li wî anî, lanet li her kesî anî.

Nışangir li debanca xwe ya dûxan jê derçû nîrî û nişir debanca xwe kişand ber bi lingê xwe. Hewqasî bi şit kişand ku teqînî ji demenca wî çû berik hemâ di ber serî wî re derbas bû. Nışangir tirsîya, hiş jê çû û kete nav şokekê. Rehêne wî sist bûn. Ewrîn tîrsê ji hisê wî wenda bûn û keniya.

Ji berika xwe şûşa viskiyê derxist û heya ku şûşe vala be, vex-war. Ji her tesîra viskiyê xwe di eniyê de hîs kir. Biryara xwe da ku terka banî bike û li qumandanê xwe bigere ku li ser tiştî qewimî agahdarî bide. Derûdora wî de bê-dengiyê de bû. Debencâ xwe rahişt û xist berika xwe. Pişte di bin ro-nahîya asimanê de xwe ber bi jêr ve kaş kir.

Dema hate ser rî ji nişka ve me-raqazanîna dijminê kuştî kete dilê wî. Kî dibe bila bibe nışangirekî baş bû. Gelo wî ew nas dikir ya na. Belkî yek ji hevalen wî yê ji ordiya berê bûku bûbû du beş. Bi-ryara xwe da ku here wî aliye rî û lê binêre. Bi balkêsi derûdora koşa kolana O'Connell nîrî. Li jora kolanê teqîna tifinga bû lê derûdora nışangir bêdeng bû.

Nışangir ber bi aliye din ê kola-nê baz da. Bû reqîna tifingele otomatik û berik ketin derûdora nîşangir lê xwe xilas kir. Xwe ser zikê xwe avêt tenîşa laşê mirî. Deng ji tifingê hat birîn.

Nışangir kesê kuştî ser pişte zivrand û li rûyê wî nîrî, birayê wî bû.

- En wek Yilmaz Guney, Yaşar Kemal û Selîm Berekat eger bi ci zimanî binivîsandana dê dahêner û nîvîskarêna rasteqin bûna, lê yên me tenê di Kurdi de dikarin bibin nîvîskar!!

= Nîvîsîn te "tu xizmetê ji rexnegiriya zanîstî re nakan." "Estetîkeke literatûrî tê de tun-eye". Ne ez wilo dibêjim, lê S. Demir vêya dibêje!!

- Gerek vê peyvê ne ji min re bibêje lê ji "mamosteyan" xwe re! madem wilo ye îca cîma bi sev û roj êrîş Armancê û redaksiyona wê dikin! Dêmek S. Demir rexnegiriyeke zanîstî dixwaze?! "Rexnegiriya zanîstî" tu carî li seranseri dîroka xwe, pirsgirkîn estetîkî des tîşan nekiriye, tu carî nebûye bîr û baweriya ku naverok û şewyan li ser nîvîskaran ferz bike. "Rexnegiriya zanîstî" ma dizane ci ye Elîko!

= Na bi Xwedê! Ê yabo wa rexnegirekî mezin wek S. Demir nîzane îca ezc çawa bizanibim!!!

- Xewzka ev tenê bûya lo!

Wexta ku çanda mîletekî bêxwedî be, wilo bi serê wê iê!

= Lî Misto ez bawer nakim ku tu yê bikarîbî vê hevpeyvînê di Armanacê de belav bikî, çunki S. Demir bi navê xwe û bi navê xwendevanen berzûrî redaksiyonê dibe da ku nîvîsîn te çap nekin!!

- Erê Elîko, ji S. Demir we ye ku Armanc jî di bin desthilatâriya redaktor de radibe û rûdînê. Ji ber ku ew hîni prensibîn Nûdemê bûye; hîni prensibîn xwedî û ber-pirsiyare giştî "Chef Editor" bûye. Hîn bûye ku çawan gerek bîryara belavkirina nîvîsan ya "Chet Editor" tenê be. Xwe ji bîr kîriye Elîko!!

= Îca cîma çûye û hatiye û li ser "redaktor" peyviye?

- Ew nîzane pê ku "Armanc a-zadiya ramanê diparêze; baweriye bi cihêwazî û pîrhejmariya bîr û baweriyanîne; ew nîzane pê ku Armanc li dijî baweriya yekta ya ku hewl dide ku afîrandin û rexnegiriye bîkuje radiweste!! Armanc mezintîrîn neynîka vê qonaxî ye; pêwîst e her kes bikaribe

rastiya xwe û kurte-bejna xwe tê de bibîne. Çunki eger neynîke wisa nebe dê ev qonax bê "sahid" derbas bîbe û Armanc jî vê yekê napejîrîne! Çunki getîrîn dersen tecrûbê çewtiyên wê ne birako!! Pişte S. Demir dizane ku armanca Armancê ew e ku bikaribe nîvîs û bîr û baweriye "ne wek xwe" belav bike angò bikaribe ramanen "en dîtir" di rûpelên Armancê de bi cih bîka yan na?

Çunki bi qebûlkirina "ne wek xwe" û "en dîtir" Armanc bi şex-siyeta xwe bawertir dibe û erka-rojnamegeriya xwe ber bi şes-pandîn ve dehî dide...

Ji bo ronîkirina koşeyen tarî ci di civaka Kurdi de û ci jî di hundi-re mirovî Kurd de be, ji bo eşkerekirina şewti û lawazîyen şex-siyeta mirovî Kurd, Armanc tu carî nakeve erê-nayê de.

= Misto! Kuro lao mirov dibê qey S. Demir di dilê F. Cewerî de ye, bê çiqasî dixwaze şîklê M. Masto binase...tu dizanî?! Ez bi xwe ji dixwazim ku tu vê arzuya wan bi cih bînî?!!

- Bîne birako! Ezê eşkere ji wan re bêjîm: Ez bi xwe li gel wan kesa me yên ku pîrsan di ci-vakê de biafrînin. Çunki afîrandîna pîrsan jîndarî û nîşana tendûrîtiya civakê ye! Fermo! Bi ceger-darî bersiva pîrsen min yên giring û rojane bidin! Ez bi xwe ranewestim. Ji bo ez bikaribim bîjîm divê ez di haletê lêpîrsin de bîm. Ez tu carî nabim nîvîskar û ne ji rexnegir û ne jî doktor im... Ez ji wek hemû xwendevanen xwendevanen im, ji zimanê xwe û ji edebiyata xwe hez dikim. Li beram-bîr nîvîsîn qelp û sexte ci bi Kurdî bin û ci jî bi sansekîrî bin, bi hemû hêz û siyana xwe radiwestim.

Ne ez ji wan fedî dikim, ne jî ji navê xwe û ne jî ji karê xwe û ji mîletê xwe. Ez xwe bi tevan ser bilind dikim. Lî hetanî dereca ser xwarkirin û xwêdangirtinê ez ji ber berhem û nîvîsîn M. Uzun û F. Cewerî û çendine dîtir yên wek Derwê Ferho şerm dikim. Nemaze wexta ku di dezgehê Ewrîne

ûpayê de nûneriya çanda gelê me dîkin. Ü ji wan kesen ku naxwazîn ez zimanê xwe li ber nîvîskaran dirêj bikim, dibêjîm. "Xwendevanen bas ji nîvîskarê nebas çetir e".

Ji weşanxana Jîna Nû pîrtûkekê nuh

Ehmed Huseynî
Rono
û
Sirûdên Bêrikirinê

Adresa Xwestinê
Jîna Nû
Box: 152 16
161 15 Bromma - Sweden

MİHEMED BEKİRÎ DINYA XWI BEDİLNAY



Mihemed Bekir

Welatperwerê erjayî Mihemed Bekir 29. 12. 1994 di dinya xwi bedilnay.

Mihemed Bekir kam bi?

O Kurdanê Kurdistanê Sûriya ra welatperwerêdo pak bi. 20. 7. 1942 di dewanê Efrînî ra Çeqelan (Çeqeli) di dayka xwi ra bi. Gedeyîya yê dewi di viyarti. 1958 di, demewo ki hima xortêdo şiyisserre bi, bi endamê (azayê) Partî Demokratî Kurdistanî Sûriye (PDKS).

Beyntar ra zaf nêsi, çiyo ki Kurdistan di yeno vêşaney welatperweranê Kurdan ser, yê sere di zî ame; polisê Sûriya 1960 di yê geyra. A serri nê la serra bîniyanî 1961 di gîriya û işkence dî. Hinde işkence dî ki yew goşê yê giran bi, weş nêşnawitînî. Yew embazê yê vatînî, "labelê zaf xemê Mihemed Bekirî nêbi, çend rojî işkence ra pey şewa ki veradiyabi, yew embazê xwi dibi, vatbi hadê ma şêri sînema".

Mihemed Bekirî 1962 di lîse qedênay û a serri şî Lubnan, hetanî wesarê 1963 weyra mend. Lubnan di mamostayı (mu'alîmî) kerdi û karê rastkerdişê (teshîhî) yew kovari (dergi) di xebitiya.

1963 di ebi yardımê Partiya Demokrati bûrs girewt û şî ki Çekoslovakya di biwano. Yê wica di muhendiseya elek-trîkî wendi û 1973 di wendîşê xwi qedîna, bi muhendîs.

Demewo ki Çekoslovakya di bi Mihemed Bekirî Komela Wendekaranê (Telebanê) Kurdan a Awrûpa miyan di aktîfkî xebitiya.

PDKS, 1966 di xwi miyan di bîbî di parçey. 1970 di, semedê yewbiyayîşê Kurdanê welatperweran ê Kurdistanê Sûriya û nê di şaxanê partî, Kurdistanê Cenûbî

di yew kongre bî. Namey na kongre "Mu'temerî Niştimanî" ("Kongra Niştimanî") bi û kongre bi xwi binê kontrolê Mistefa Barzanî di bî. Barzanî waştînî ki Kurdê Sûriya yew bî û yew parti miyan di ca bigîrî. "Kongra Niştî-manî" Kurdistanê Başûrî di Nawpirdan di bîy. Mihemed Bekir zî şibi na kongre. O, kongre di delegeyê Kurdanê Wendekaranê Kurdistanê Sûriya yê Awrûpa bi.

Weyra Mihemed Bekir, delegeyê ciwanan o ki Yewîya Sovyetan ra û o ki Kurdistanê Sûriye ra ameybî piya şîy Hacî 'Umran di Mistefa Barzanî dî.

Labelê na kongre ra pey zaf hêviya Mihemed Bekirî partî ra nêmendi, hêviya yê şikiyay. Kongre ra pey, Mihemed Bekirî delegey ciwanan ê Kurdistanê Sûriya Mihemed Enwerî ra vatbi "Ez hinî fek siyaset ra vera dana". Û raşa zî aw roj ra pey yê aktîfkî xebata siyasî nêkerdi.

Kongre dim a Mihemed Bekir, verî ki şero Çekoslovaka şî Tirkîye û weyra Osman Sebrî di (Osman Sebrî aw wext Tirkîye di bi).

Mihemed Bekir 1974 di keyna Osman Sebrî, Hêvî reyra zewiciya. O 1978 di ame Îsveç (Swêd) û aw wext ra pey Îsweç di mend.

Îsveç di Mihemed Bekirî karêdo erjaye kerd: New hûmarê kovara Hawari herfanê 'Erebkî ra transkribe kerdî, yanî newe ra ebi elîsba Kurdkî ya ewroyini (ebi herfanê Latînkî) hazır kerdî, nê û 'eslî yînî (ebi herfanê 'Erebkî) 1987 di Stockholm di day çapkerdene.

Wendoxê nê hûmaranê Hawar a newa û welatperwerê Kurdan do Mihemedî Bekirî xwi vîr a nêkî.

Wa ganê Mihemed Bekirî şad bo.

FERHENGÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ-III

Malmîsanij

Kirdkî (Zazakî)	Pehlewî*	Kurmanckî
ca.....	cîvak, gyak, gah.....	cih, cî
cam.....	cam.....	cam
cawîtiş.....	coyîten, cûten.....	cûtin, cûyîn
cenawer, cinawir, ganawir.....	canever, gyanwer.....	cenawir, cinawir
cenayox.....	cen, zen.....	-jen (yê ku dijene)
ceng.....	ceng.....	ceng
cenî, cinî, cenêki, cinêki.....	zen, cen, zehanek, ziyanek.....	jîn, jînik
cenîyey.....	zenîh, cenîh.....	jînî, jînîtî
cew.....	cew.....	ceh
Cihud, Cuhud, Yahudî, Yawudî.....	Yahût, Yehûtîh, Cehût.....	Cihû, Yahudi
ciwan, cuwan.....	cuwan.....	ciwan
ciwanî, cuwaney.....	cuwanîh.....	ciwanî, ciwantî
ciwanêne, ciwyayîş.....	zîsten, zîvesten; cenîh.....	jîyan, jîn
cîgere.....	ciger, ceger.....	cîger
cuwal, gale.....	gewal, cuwal.....	çewal

Ç

çakuç.....	çakoç.....	çakûç
çale, çali.....	çah.....	çal
çapiksuwar, sivik.....	çapûk, şepîk, şepak.....	çapik
çapiksuvarî, sivikî, sivikey.....	çapûkîh.....	çapikî
çar, çehar, çahar, çihar, cor.....	çehar, cafar.....	çar
çare, ri.....	çîhr, çîhrek, rod.....	rû
çare.....	çar, çarek, çare.....	çare
çare kerdene.....	çarek kerdene.....	çare kirin
çarig, çêregi.....	çeharêvek.....	çaryek, çarîk
çargoşe, çehargûşe.....	çehargoşek, çetreng.....	çargoşe
çarsey.....	çeharset.....	çarsed
çarşembe, çarşeme, çarşime.....	çeharşumbet.....	çarşemî
çarşu.....	çehar sûk.....	çarşî
çarwe-y.....	çeharpad, çeharpay, çeharvak, çarvak.....	çarpê
çeki, çina, kinc.....	camek.....	çek, kinc
çember-i.....	çember.....	çember
çend, çendi.....	çend.....	çend, çiqas
çendî, çendey.....	çendîh.....	çendî
çeqal, çeqel.....	şexal, uşkal.....	çeqel, çeqal
çere.....	çerek.....	çere, çeregeh
çerm.....	çerm.....	çerm
çewres, çowres.....	çehel, çehil, çihil.....	çel, cil
çi, çê.....	çê.....	çî
çira, çila, çilay.....	çerax, çirax.....	çira
çim, çism.....	vân.....	çav, bînahî
çime.....	çesmek, çah.....	çavî, çavkanî
çimkor.....	korçeşm.....	çavkor
çi rî, çi ra.....	çê ray.....	çî ra, cîma
çînitene, çînayîş, weçînitene.....	çînîten, çîten; çînişn.....	çînîn, dirûn
çîy, çî.....	çîş.....	tiş
çogani.....	çopkan, çopikan.....	çogan
çuwa, çiwa.....	çop, çopek.....	ço

*Kelimeyê Pehlewîyê ki tiyadi nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Ferveşî, Ferhengê Pehlevî

Ferhengê newe vejiya!

Adrese:
Box 3088
161 03 Bromma
Stockholm/Sweden

**FERHENGÊ
KURDİ-TIRKÎ
(Zazakî)**

**KÜRTÇE-TÜRKÇE
SÖZLÜK
(Zazaca)**

Munzur Çem

NEYNIK

Serokkomarê Kurdistana Federe

derdixin" û dûre jî biryara girtina seroktiya herdû aliyan derxe, li eniya şer e, li eniya şer e.

Heger ez bedela te bûma, ez nedîcûm eniya şer û min li tenîşa aliye kî cî nedigirt. Ezê bi biryadarî derketima û min ê bigota "geli camêran, ev emrê dewletê ye, ji seet 12'ê şevê pê ve şer rawestin". Heke na, minê li hemberî herdû aliyan şer bikira, min ê li ser navê dewletê emrê girtina Mesûd Barzanî û Celal Talabani û şerxwazên li dora wana derxista. Min ê dû re jî, hêzên wan yên çekdar qedexe bikira, min ê yên dewletê ava bikerana. Ên wan ji bo aştiyê û pêşerojê tehdit in, edî nema meşrû ne.

Ha, tu dê vî karî bi kî bikî! Xwêlîser, tu ji bedêla serokomarê Kurdistana federe ve yî, gazî xelkê xwe yên reben û rewşenbirîn welêt bike, wana di bin seroktiya xwe û parlamento ya xwe de bîcivîne û bi qeweta wana desten şerker û keleşan li kelemçan xîne. Heger tu wilo bikî, tu dê aştiyê li welatê xwe li dar xînî, tu dê karîbi dewleteke xurt damezirînî, devê tivingan ji zikê Kurdan derxînî û tirsekê di dilê dijiminên mezintir xînî. Heger tu wilo bikî, wê gelek Kurd bêna hawara te.

Birêz serokomar, heger pereyên we nînin hûn girtiyan rîbikin Haagê, tu û parlamento ya xwe rûnîn, wek dadgeran kar bikin û destbixwînan di zîndanan xin.

Bawer be, heger tu wilo nekî, wê hinek rabin û gazî Saddam bikin, ewê bê û wî karî bike. Wê te

jî bigire. Bawer be, wê gelê reben we neparêzê. Bawer be em Kurdî din tu hêşiran ji bo we râjînin. Erê rast e, em beşekî ji welêt wenda dikin, lê dema herdû alî ji dijiminan bêtir mirovîn me bikujin û hûn jî nikarîbin tiştekî bikin, emê cawa karîbin ji bo we bigrîn?

Birêz serokomar, dînyayê ji bo ku hûn karîbin welatêkê ava bikin û xwe bi xwe idare bikin, ji bo ku Seddam nema karibe bê Kurdan bikuje, piştgiriya we kir. Tu gelên din piştgiriyeke wilo mezin negirtiye. Divê edî hûn karîbin li ser piyê xwe rawestin. Rast e, herdû salen pêşî, we gelek tiş ava kirin. Lê iro sal û nîv e hûn hil-diweşin. Ez îsal havînê li vir bûm, min dit. Heger hun bi kuştinê û talanê hûn ji Seddam paşdetir nemînin, wê dinya ji rîya wî derkeve. Qet nebe ew him dikuje û him jî nan dide. Wê bê! Hûn xwe ji revê re nakin! Lê ma ka arteşa te?

Birêz serokomar, gelo dibe ku aliye kî biheq be û aliye din jî neheq be ya jî gelo dibe ku aliye karibe yên din xelas bike? Ya jî hemû rabin xwe li dora aliye kî bidin hevdû û yê din rût û bêxwedî bîhêle? Ez bi xwe ne bawer im. Aliye kî nikare yên din xelas bike. Heta aliye, yên din xelas bike, ew bi xwe jî dê xelas bibe. (Heger heta wê wextê Saddam neyê). Mixabin heta wê wextê hevwelatiyên te jî xelas dibin.

Dûmahîka nivisan

Dîsa şerê xwekujiyê

kîtiyê. Aşîreta Herkî aşîretêk gewre ye, berî bi Partiyê re bû, nuha ji Partiyê vegetiyaye û çûye ber Yekîtiyê. Ya sêyem ji Partî rî nade ku hûkumet û parlamento kar bike.

Li gor iddayê Partiyê jî, Yekîti dixwaze hêzên derveyî xwe berteref bike û bi serê xwe bibe iktîdar û ji bo vê yekî jî Soranî li dijî Behdîn tûj û mobilize dike dakû nakokiyê navbera wan hîn kûrtir bibe, Kurdistana azad bibe du perçe. Partî dibêje; "Yekîti naxwaze hilbijartin çêbibin û peymanek ku navbera me herdû hêzan de hatine ûmzekerin Yekîti bi ci nayne."

Ev idfa ji aliye Samî Ebdurrehman ku di hevpeyvîna xwe ya di 25'ê Çileya Pêşin de bi radyo û televizyonâ Kurdistanê re kiriye tekar dibe û weha dibêje, "ji her tişî wê-rantir ew e ku Noşîrwan radibe Kurdistanê perce dike bo Bahdîn û Soran ku em tu cara qebûl nakin. Ji ber çibe bila bibe; ji ber ci esas, yan jî ji bér ci bahaneyî be; ci bahaneyî cografi, yan zaravî be, ci

bahaneya dirokî yan tiştekî din be, em perçekirina Kurdistanê qebûl nakin. Çunkî perçekirina Kurdistanê bi her awayî xizmetê ji dijmin re dike."

Di dema li Kurdistana başûr birçibûn û perîşanî heye, feqîrî û bêçareti zêde bûye, diviyabû herdu hêzan parlamento ya xwe qewîm bikirana û bi rîya wê çarayan ji eş û derdîn xelkê re bidîyana, diviyabû ji cihanî re bidîna xuyanî kîrin ku Kurd jî dikarin wek mileten cihanî xwe bi xwe idare dikin û diviyabû bîr û rayen dijminen xwe li ser xwe pûç derxînî. Lî ew herdu hêz ketîne qırka hev, yek dixwaze yê din ji holê rake. Xwe reben û piçûk dîkin, xelkê bêhêvî dîkin, dînyayê bi xwe dikenin.

Di destpêka Gulana 94'an de di navbera herdû hêzan de dîsa şerê birakuiyê çêbûbû û ji hev bi hezaran kes kuştibûn. Bi gustûgoyan ev şer rawestiyabû û serokên herdu hêzan bi hevre peymanek imze kîribûn.

Lewend Firat

Êşîr û Netewe

esîran newekhev û bêistûkar bûye. Geh li cem tevgera millî, geh ji li dijî wê, an jî bê ali mane. Ev yeka han bi sedan car dubare bûye. Ev ji hoyen jorîn, yên ku fenomena eşîri dinimînin dihêt. Ji ber fenomena eşîri, herweha tecrûbeyen dirokî, rewşa siyasi li Tirkîyeyê û ya navneteweyî liberçavderbaskirina awayê têkoşînê elzem dike. Heger bi şeweyekî din bihête gotin: Li Tirkîyeyê di xebata xwe ya siyasi de, gava em wek usûleke bingehîn riyen legal û demokratik bigrin, bi raya min gelşeyen ku di nav eşîran, tevgera netewî û eşîran de rû didin; û her-

weha bi destê dewleta Tirk bikarânîna eşîran li hember tevgera millî dê nehêsan be. Ji dewletê re ev fersend dê bi rehetî peyda nebe.


Bajarên kurdan divê alaya têkoşînê bilind kin, yekîtiya neteweyî û demokratik biafirîn. Gava bajarên kurdan ew rola pêwîst -ya ku di avahiya civakî de divê bilizin- hildin ser milen xwe, dê dewra eşîran kêm bibe. Di prosesa iktîsادî, civakî, kültürî û xwezanîna millî ya kurd de, ev fenomen dê bêhna xwe ya dawîn bide, ber bi tunebûnê ve biçe û bihele.

Huner û Hunermendî

Ev tiş rastiyek e; Hetanî ku mirovahî hebe huner jî dê berde-wam bike. Dê her şaxekî hunerê li gor xwe dînyayêke xwe biafirîn. Neteweyen ku ji bo afirandinênuh cehd nekin û li ser esasen moderniyê hunera xwe pêste naxin, dê paşte bîmîn. Divê bi zanatî û zanîstî xwe guherandin çêbibe. Hunermend afirandinênuh xwe yê herî baş di dema guherandinê de dide. Di dema neguherandinê de ber hem dernakevin holê. Huner çavkaniya xwe ji lîvbaziye civakî digirê.

Huner hergav û di her demî de xwe objektif hîs dike. Û li gor dînya xwe ya zanîstî jîyanê û civakî şirove dike. Hîmê hunerê her tim jîyanâ civakî ye. Huner di dînya xwe de tim deriyê xwe ji nuhkîrinê û pêşveçûnê re vekirî dihêle. Ew di şirovekirina xwe de azad e û li gor realiteye hareket dike.

Gelê Kurd di nav pêvajoya têkoşîna rizgariyê da ye. Gelê Kurd ne



Necla Baksî

*Di 12. 12.1980'yi de xuşka
min Necla Baksî û zavê min
Huseyîn Aslan û hogirê
wan bi destê hêzên
kolonyalist ên Tirk û Sûrîyê
hatin kuştin. Ez wan wek
neferen têkoşîna me ya
netewî û sosyalîzmê bi bîr
tînim û li ber giyanê wan ê
pak bi rezdarî radiwestim.*

Şukran Baksî

Huseyîn Aslan

- ◆ Ji bo dibistanan
- ◆ Ji bo komeleyen ku kursen zimanê Kurdî didin
- ◆ Ji bo herkesê ku bixwaze Kurdiya xwe pêş bixe

Destpêka Rêzimana Kurdi

Haydar Diljen
Pirtûka xwendin û xebatê
Rûpel: 64, form: A4
Çapa duymen: Jîna Nû
Buha: 65 SKR, 15 DM, 8 \$


Navnîşan:
Jîna Nû
Box: 152 16
161 15 Bromma-Sweden
Faks: 8-801825
Tel: 8-803135

Kes yan jî dezgehênu ku bixwazin vê pirtûkê bikirin, divê vê fişê tijî bikin û bisînîn

Min pereyên pirtûkekê/..pirtûkan razandin
hesabê weşanxana Jîna Nû (Postgiro: 503799-9)
Ji min re pirtûkekê /pirtûkan bişînîn

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....



◆ Ev pirtûk bi metoda induktîv hatiye nivisîn. Ev metod li ser aktîv-bûna şagirtan dimeşe. Li gor vê meto-dê dersdar bes rînîşandar e.

◆ Ev pirtûk ji bo pengava navîn (4.5.6.) hatiye amedekirin. Lî salmezinê ku bixwazin kaydeyên giştî yên rîzimana Kurdi fîr bibin jî dikarin bi kar bînîn.

◆ Her kesê bixwaze qaydeyên giştî yên rîzimana Kurdi fîr bibe, yan jî fîr bike divê ji xwe re yek ji vê pirtûkê peyde bibe.

Sersaxî

Di 22'ê Çileya Pêşin de li Stockholmê di neficeya qezayeke bê taşîhi agir bi xaniyê hevalê me, serokê berê yê Federasyona Kurd li Swêdê Salih Înce ket jîna wî Eva û kurê wî yê 7 salî Kendal wefat kirin. Em wek Redaksiyona Armancê ji malbata Înce re sersaxiyê dixwazin.

Kultur û Politika

Riza Polat

Hevdemê Galileo Ehmedê Xanî

Îsal sêsed saliya nivîsan-dina pirtûka Ehmedê Xanî a Memê Alan e. Heger em Kurd jî azadbûna û xwediyê dewletbûna belkî me jî niha festivalen sêsed saliya nivîsandina vê pirtûkê û konferrans û panelên ku felsefe û fîkrîn nivîskar têde bihatana munaqese kirin dê amade bikiriba. Lê mixabin di vê sêsed saliyê de hîn jî Kurd bindest in.

Me Kurdan heta nuha jî li ser berhemên Ehmedê Xanî û di wan berheman de xususiyetên feleseffî, edebî û fîkrî mu-naqseyen kûr û ciddî venekirine. (Heger em xebañ çend Kûrdêñ bi lehçeya Soranî nivîsandinê nehesibînin)

Ji ber vê sebebê jî Ehmedê Xanî û qîmeta berhemên wî baş na-yen fêm kirin. Di havîna 1986'an de li Kereç (heremek Tahranê ye) şâîrê rehmetî Hejar ji min re bahsa pêşgotina ku wî ji bo wergerandina Mem û Zîn bi lehçeya Soranî dinivîsine dikir. Wî digot; "dema min Mem û Zîn wergerand Soranî, ez gelek li ser wersiyo-nîn din jî sekinim, lê min dît ku fahm kirina Mem û Zîn pîr zehmet e. Çunkî Ehmedê Xanî di Mem û Zîn de gelek gotinê bîyanî karanîne. Wek mîsal gotinê Zerdeşî, Ermenî û Farisi pir in. Dema mirov wan gotinan fahm neke, zahmete ku mirov jî vê berhemê fahm bike". Wek ez dizanim wî ev nêrinê xwe di pêşgotinê jî anîn zîmîn.

Bêşik ev nêrinê yê rehmetî Hejar ên. Lê nêrinê ber bi aqil bûn. Wek tête zanîn eger iro ferhengekeke şîir û nivîsandinê Fuzûlî, Nedîmî tunebûna yê kêm kesan ji berhemên Fuzûlî û jî Nedîm fahm bikiriba.

Berî demekê gava min bihîst Mele Abdullah Varli Quranê wergerandiye Kûrdî û hatiye çapkirin, yekser cesa-retâ rewşenbîr û alimên dînî yê Kurdistan yê iro û cesareta Ehmedê Xanî ya berî sêsed salî hat bîra min. Li gor dînê İslâmî wergerandina Quranê ne munasib e. Çunkî Quran wexta bi Erebî be, mahne û meqsedîn wê têf fîmkirin dema ku ew tercumeyê zîmanî din be ji mahna xwe hi-nek tiştan wenda dike.

Bêşik eviye ciyê mu-naqseyek din e. Lê piraniya mîleten musulman û azad ên,

Quran wergerandine zîmanê xwe, beriya sêsed salî di bin heybeta İmparatoriya Osmâniya de wergerandina Quranê û heta nivîsandina teksteñ dînî gelek zahmet bû.

Lê Ehmedê Xanî di wê demê de cesareta nivîsandina Nûbara Biçûkan nîşan da. Dema Ehmedê Xanî Nûbara Biçûkan nivîsi hesab kiribû ku yê ji medresê û ji cemata dinî êris û cezakirinê giran dikare ser wî de bibarin. Lê wî ji wek Galilei hesaba her-tiştî kiribu.

Ehmedê Xanî jî, di sed-sala hevdan de, di jîyana Kurdevarîyê de du gavên dîrokî avêt. Di nav camia ûlameyên dînî û medre-seyê de cesaret kir ku ne bi zîmanê mûqades bi zîmanê xwe Nûbara Biçûkan nivîsi. Wî şîyarbûna hestên netewî û millî bi cesaret û bi zîmanek intellektuelî di Mem û Zîn de anî zîmîn.

Ji paş hemd û selawetan Ew çend kelîme bi ji lûgatan Vêk existin Ehmedê Xanî Navê Nûbara Biçûkan lê danî Ne ji bo sahib rewacan Belkî ji bo piçûkêt Kurmancan Mirov ji wan gotinê Ehmedê Xanî jî fahm dike ku ew jî wek Galilei bi tirs bû. Wî tirsa xwe ya ji ülemayê camia dînî bi van hevokan anî zîman: "Ne ji bo sahib rewacan Belkî ji bo piçûkêt Kurmancan". Lê ewî jî wek hevdemê xwe risk hildabu ser milan. Her du jî di sedsla hevdan de jîyabun. Galileo astrolog bû û sisteme stêrkan keşif kiribû ew dibine ku dinya ku ew têde dijî bîyî ku mirov hay jê hebe li dor xwe dizivire. Ji bo ku wî ev nêrin anîbû zîmîn ew ji aliye dîrê ve hat gunekarkirin.

Hevdemê Galilei Ehmedê Xanî jî, di sedsla hevdan de, di jîyana Kurdevarîyê de du gavên dîrokî avêt. Di nav camia ûlameyên dînî û medre-seyê de cesaret kir ku ne bi zîmanê mûqades bi zîmanê xwe Nûbara Biçûkan nivîsi. Wî şîyarbûna hestên netewî û millî bi cesaret û bi zîmanek intellektuelî di Mem û Zîn de anî zîmîn.

Ji bo ku Ehmedê Xanî û berhemên wî bîn fahmkirin xebatek û lêkolîneke ciddî di derheqê berhemên wî de pêwîst e. Ehmedê Xanî di sedsla xwe de bingeha şûûr û hîssîn millî yê kurdayetîye ava kir. Ji bo ku em kurd daxwaz û felsefaya wî fahm bikin bi her berhemeke wî re ferhengeke bi rîk û pêk jî pêwîst e.

BEROS



Mahmûd Lewendî

Ji Têmûrê Xelîl bo Beroşê

HINEK JÎ PÊKENÎN

Dixwaze keça xwe bide mîr

-Keça min ez dixwazim te bidim mîr!

-Ez ne li dij im, lê divê ku xort li gor dilê min be!

-Tu hê zarok ì, tu tê nagîhî ku bi dilê te be.

-Madem ku ez zarok im, tu çîma dixwazî min bidî mîr?

Cîma kêm bûye?

-Gelo ji bo çî li gundê me şîr, post, rûn, mast, hêk kêm bûye!

-Ji ber ku xwedîheywanen (an jî şîvan û gavanen) gund dev ji karê xwe berdane dest bi siyasetê kirine, loma!

Bîr û bawerîyên xelet derheqê jînan de

-Memo, ma tu û Misto hûn çî yî hev tê?

-Em her yek kurê dotmamekê ne.

-E.. ew hîc, min jî digot qey hûn merîv hev in!

Sîr sîr e, jîn jîn e, mîr mîr e!

Mîr malxweyê malê ye, jîn malxweyê meibaxê ye!

NE NÊZÎKÎ AQILA YE, LÊ RAST E

*Kurdeki Erîwanê; Elîyê Cemal yanzdeh mehî ji diya xwe bûye.

*Dilîkê kurdeki Ermenîstanê; Mecîte Seydo li aliyê rastê ye.

*Berî çend salan li Sovyetê pirtûkxana şexsî ya herî dewlemed ya zanayê kurd Şamîl Eske-rov bûye ku tê de yanzdeh hezar pirtûk hebûne.

*Li Sovyetê wek berpirsiyâr berpirsyartiyâ herî dirêj ya Mîroyê Esed e ku berpirsiyâr roj-nama Riya Teze bû.

*Kurdên Ermenîstanê Xelîlê Çaçan, bermalîya wî Eznîva Reşîd û kurekî wan bi tevayı li ser hev 70 sal di radyoya Kûrdî ya Erîwanê û rojnameya Riya Teze de kar kirine, 1700 sitran û piyes kirine milkê radyoyê û ji hezarî zêdetir go-tar û serpêhaû nivîsine.

*Beşek ji êl û eşîretên kurda yên Rojkî, Şerqî, Sîpkî dînê xwe ve Eziidî ne, beşek jî jê musul-man in.

*Kişika herî kevn li Ermenîstanê li gundekî kurdan ku navê wê Karvenseray (nuha; Jiyana Nuh) e hatiye dîtin.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

XEWN ANTREMANA MÊJÎ YE

Gelek ji lêkolînerên mîjiyê teoriyê xwe yê ku bi fizyolojîyê izah dike, pêşkêş kirine û xwestine se-beba hebûna periyodê xewnê me yê herşevê izah bikin. Lîgor yek ji van teoriyan ku giraniya xwe ge-lek e, periyodê xewna vatiniya xwe ya antremana hucreyek mîji heye. Çawa ku hucreyên masûlkeyen (lemlate, zeblek, zîper) mirov hereket nekin sist dibin û zîf dikevin, hucreyên mîji bi kêm'bûn an jî tu-nebûna xewna zîf dikeve. Li gor vê teoriyê di xewnê me de tiştîn ne giring hene.

Zarokên nûzayî xewnê xwe ji yê zarokên mestir zêdetir e û lêkolîner gîhiştine wê netîcîyê ku zarokên 7-8 mehî yê di zikê diya xwe de ne; xewnê wan hêjî zêdetir e. Vê yekê lêkolîner wiha izah dike; zarokên di zikê diya xwe de û zarokên nûzayî ji derive kêm stîmulans distîn û ji ber vê yekê jî hewcedarî zêde xewin bi xewna ku bikaribin hucreyên meijîyen xwe antreman bikin.

XEWN TESÎRA

SERPEHATIYÊN DO BI RÊK Û PÊK DIKE

Teoriyeke din a modern xewnê ji muqaye-sekirina mîji û datayê tê. Lîgor vê teoriyê xewn alîkariya bi rîkûpêxistina tesîren roja berê (do) dike ku di tecrubeyen me de sistem zêdetir dibin. Li gor vê teoriyê karê bi rîkûpêxistina serpêhatiyê iro di demen xew-nê de dom dike. Loma jî hewcedariya me bi xewna heye da ku em bi karibin tiştîn erinî (tiştîn baş) ji serpêhatiyê xwe yê do bi dest bixin.

XEWN PROBLEMA DIBİŞKÊFE

Li gor vê teoriyê, demen xewnê ji bo fîrbûn û fîhîmkirin jî bi fîyede ye. Hin kes hene ku dibejin ew problemen zor û giran di xewna xwe de dibîşkêfin wek nîmûne mûcîdî makîna dirütinê iddiâ dikir ku wî problemen teknîkî di xewna xwe de hel kiriye.

Wekî din jî tê gotin ku xew - dixwazî bi xewn be yan bê xewn be - gelekî alîkariya fîrbûnê dike. Lî li gor lêkolîneke Amerîkî du kesen ku teksteke dixwîn û dikevin xewê, yê xewn dibîne teksta xwendî jî yê xewn nedîtiye baştar bibîrtîne.